- 1506 Mikavili ligel pêrûniştina Serokê xwe Gonfaloniere Soderini de Bergirêmilîyî Florentînî date bisazkirin, yê ku ew bi Leşkerekî gelêrî ve li ser bingehê Serbazîkirina erkî ve dihate bingehkirin. Ew bi siparatina karê Komarê ve ligel Papayê Julius II. de di şerê wî de ji bona çûna Bologia dihate bidîtin.
Avanîkirina Kenîştî Peters ji bal Bramante de li Roma de date bidestpêkirin.
- 1507 Mikavili bi Serokê karmendiya Leşkerîyî nuhsazkirî "Nuovo della Miliizia" ve hate binavkirin. Ew ligel Francesco Vettori de ji bona nik Qeyserê Maximilian, yê ku wî dijî Italya hêrîşek dida bilikarxistin, hate binardîn, di wê dema ku Parlemana Imperatorî dihate bicivandin. Wî dixwets, ku ew beramberî dana peran maldarîyên Florentînîyan ji bal Qeyser bide bigirawkirin.

- 1508 Mikavili careke din ji bona nik Qeyser Maximilian li Innsbruck de hate binardin. Li wêderê de wî raportê xweyî bi nav û bang ve li ser Qeyser de date binivîsandin. Li paş vegera wîna de ew bi serokê Leşker ve hate binavkirin, yê ku ew beramberî Pisa dihate birawestandin.
Qeyser Maximilian, Frensa, Spanya û Papa "Hevgirêda Kamberayi" ligel hevdû de beramberî Vênêtsiya dane bigirêdan.
Raffael dest bi nigarîkirina oda razana Papa li Vatikan de (Stanzen) date bikirin.
- 1509 Ji bona Mikavili serokitiya dorlêgirtina Pisa hate bisipartin. Wî devê çemê Arno ji bona derya date bibendkirin, da ku ew Pisa ji gihandina derya bide birandin. Wî bi Leşkerê xwe ve di dawî dawî de Pisa birçî û belengaz date bivegirtin, ya ku wê xwe bê qeyd û merc date biberdestkirin. Vê derbasbûna berzbûna jîyana Mikavili date biderxistin. Di vê salê de jî ew ji bona Verona hate biçûyîn, da ku ew bêşapera ji bona Qeyser bide dan. Wî ew li wêderê de nema date bidîtin, jiber ku ew ji wir hatibû biçûyîn. Wî xweşxuwaniya duwemî mêjûwa Italya ji s1504 tanî 1509 de date binivîsandin.
Jacob Fuggerê Bankvanê Ausburg ji bona Qeyserê Elmanî 170 000 Dukat -Zêr- bi deyn ve ji bona likarxistina cenga wîna beramberî Vênêtsiyan date bipêşkeşkirin.
- 1510 Mikavili careke din nala Nardvan ji bona nik Padîşahê Frensa li Lyon hate birêkirin, da ku ew wî bide biaramîkirin; jiber ku ew li ser helwesta Florentînîyan de derbarê şerê di navbera Julius II. û Frensiyan de hatîbû bitûrekirin.
- 1511 Mikavili careke din nala Nardvanekî ji bona Frensa hate

binardin, da ku ew Padîşahê Frensi Lugwigê XII. ji daxwaza wîna ji bona Konzil -civîna Sermetranan- li Pisa de bide bivegirtin.

Papa Julius II. ligel Vênêtsiya de "Hevgirêdana Perest" beramberî Frensa date bigirêdan. Berî vêna wîna der sala 1508 de ligel Firensa û Qeyser de Hevgiredanek beramberî Vênêtsiya dabû bigirêdan.

- 1512 "Hevgirêda Perest", ya ku têde Papa Juliusê II., Spanya, Vênêtsiya û Ingilistan hevdû dabûn bigirtin, date biryarîkirin, ku li paş biserkevtina dawî de bi ser Frensiyan ve careke din Mala Midici li ser Florenz de bide bidanîn. Gonfalloniere Soderini li paş şikestina Florensiyan de ji serokîtiya Leşker hate bidakevtin. Bi kevtina Soderini ve Mikavili jî hate biderkirin. Ew divabû xwe ji herema Florentînî nede bidûrkin û pîyên xwe bi Şehrebanîyê ve jî nede bixistin. Frensî ji Italya hatin biderkevtin.
- 1513 Mikavili bi şaşbûn ve hate bitawanbarkirin, ku ew di nava tepgirêdanekê de beramberî bi Mala Midici de hatîye bibeşdarîkirin. Ew hate biazardan. Belam ew li ser daxwaza Sermetran Giulio de Midici de li paş Papa Clemen VII de careke din hate biberdan. Wî xwe ji bona nava gundê xwe Sant'Andrea li Percussina de li nik San Casciano de li cem Florenz date bibarkirin. Ew li wêderê de di nava perîşanîyê de dihate bijîyandin û wî bi carekê ve guhpêdana xwe ji bona xwendekarîyên xwe date bidan. Li wêderê de wî "Principe" -Mîr- date binivîsandin û herwehajî wî dest bi nivîsandauina "Discorsi" li ser dehsalîya desthilatîya pêşîyî Titus Livius de date bikirin. Ji me re veguhestineke namêyîyî dewlemend ligel Mirovên wî û Nasên wî de hatîye bihiştin, ya ku ew bi bextiyarî ve tevî hemû herifandinên pêwendîyên Folorenzî jî baştir ji wî bi bêzîyan ve hate biparastin. Weha nameyên wîna ji me re ligel Francesco

Vettori, yê ku ew Nardvanê Florentînî li Papneşînîyê de bû, û Giucciardini de, yê ku ew Dewletvanekî û Mêjûnivîsvanekî bi nav û bang bû, hatine bihiştin. Leo X. Kurê Lorenzo dé Midici bi Papa ve hate bikirin. Wî piştê pêşvexistina Hunerê û Zanistîyê didate bigirtin. Nameyên wîyî kirinagunehan ji bona avakirina Kenîştê Pitros û nemaze li Gerministanê de xwîn datin bikelandin.

- 1514 Mikavili xweşxuwaniya fêrbûna "Undank" -Bêsipasîyê- date binivîsandin. Bramante hate bimirin.
- 1515 Ludwigê XII. Padîşahê frensa hate bimirin. Lidûvanê wina Franzê I. dest bi vegirtina careke din ve ji bona Italya date bikirin. Wî Hevalbendîtiya ligel Vênêtsiya date binuhkirin û xwe ji bona ser Mayland date birakişandin. Papa, Qeyser, Spanya, Mayland û Siwêstra hevgerêdanek beramberî Frensa bi hev re dane bigirêdan. Frensiyan li nik Marignano de Peyayên Sipahên Siwêsrî dane bişikenandin. Qeyserê Maximilianê I. di aşîtiya Bruksil de bi danan Mayland ji bona Frensiyan û Verona ji bon Vênêtsiya hate bineçarkirin. Xanêdestkarîyê didin bidestpêkirin. Karxanên dewletê ji bona çêkirina çekan û kaxezêndîwaran li her cihêkî de têtin bidamezirandin.
- 1516 Mikavili "Principe" -Mîr- ji bona Lorenzo dé Midici dide bidiyarîkirin. Wî xweşxuwaniya fêrbûna li ser "Ehrgeiz" -dilbijandinê- date binivîsandin. Karlê I. bi Padîşahê Spanya, Neapel, Sisilya û Borgonya Holendî ve hate bikirin. Di bin navê Karlê V. ew bi Qeyserê Romanîyê Elmanî ji sala 1519 de hate bikirin. Michelangelo Nigarîya Musa û Raffael nigariya Sixtiniya Madona date bineqîşkirin.

- 1517 Mikavili çîroka "L'Asino d'Oro" bi xweşxuwani ve date binivîsandin.
Luther 95 Têzên xwe bi degehê Kenişta Keleha Wittenberg ve date bivekirin. Destpêkirina venuhbûnê li Elmanya de date bidestpêkirin. Li jorî çemê Ryain de Cotkaran serên xwe dane bihildan.
Hutten ji bal Qeyser Maximilian de bi Xweşxuwani ve hate bitackirin.
- 1518 Mikavili careke din ji bona Florenz hate bivegerandin. Wî serdana baregeha siyasîyî Orti Oricellarii date bikirin, ya ku ew weha li gora baxên Cosimo Rucella de dihate binavkirin. Ji Mêvanên vi bargehê jî Zanobi Buondelmonti dihate bidîtin. Wîna ji bona van herduwan "Discorsi" li ser Livius de date bidiyarîkirin. Wî li wêderê de nivîstên xwe ji bona Mêvanan didatin bixwendin.
- 1519 Mikavili ji bal Midici de pê hate bisipartin, ku ew Destûrekî ji bona Florenz bide biamadekirin. Wî Padîşahîya Destûrî ji xwe re bi başî ve didate bidîtin. Herwehjî wî pêrejî yarîyakêfxweşîyê "La Mandragola" date binivîsandin.
Qeyser Maximilian hate bimirin, (ew der sala 1459 de hatibû bizayîn). Ew bi "Siwarê dawî" ve û bi piştgirtvanê pêşvexistina Gundîyên Kole Merovanî ve dihate biderkevtin. Nevîyê wîna Karl bi navê Karlê V. Qeyserê Elmanî hate bikirin. Mala Fugger helbijartina wîna bi pûl ve bermaberî Franz I. Padîşahê Frensî datin bipiştgirtin.
Leonardo da Vinci hate bimirin. Destpêkirinên Barok serên xwe didatin biderxistin.
Luther ji bal Papa de lénifiraderkirinê hate bikirin.
Zwingili dest bi Reformation -venuhkirinê- ve li Siwêstra de date bikirin.

- 1520 Mikavili dest bi nivîsandina "Arte della Guerra" ve date bikin. Ew ji bona Bajarê Lucca hate binardin, da ku ew navcîfîya pevçûneke bazirganî bide bikin. Li wêderê de wî dest bi nivîsandina çîroka li ser jîyana Castruccio Castracani date bikin, yê ku bi Sersipahê bi nav û bang û Zaldarê Lucca ve (ji 1322 tanî 1328) dihate bidîtin. Ev Jîyannama hanê bi jîyannameya baramberî "Principe" ve tête biderkevtin. Herwehajî pêrejî wî Mikavili raportek li ser Destûra Bajarê Lucca de date binivîsandin. Wehajî di vê sale de jî li ser daxwaza Sermetran Giulio dé Medici de jê hate bixwestin, ku ew mêjûwa Florenz bide binivîsandin. Ji bona vî karê hanê her sal jê re 100 Dukat -Zêr- hatibûn bidanîn. Raffael hate bimirin. Sulêmanê II. Gewre bi Sultanê Turkî ve hate bikin. Wîna tanî sala 1560 de date biserdarîkirin. Luther fermana lênifiraderkirina Papa date bisûtandin
- 1521 Mikavili cihêkarê Sikretêrekî li nik Mîr Colonna de li Roma de ji xwe re neda biwergirtin. Wî ji xwe re karên biçû didatin biwergirtin, weha ji bona nimûne pê hate bisipartin, ku ew Xurîyekî ji bona desteyê Tevindarênhirîyê bide bipeydakirin.
- 1522 Li Florenz de tepgirêdanek beramberî Mala Midici hate bikin, ya ku têde Dostên wan ji Mala Orti Oricellarii de hatibûn bibeşdarîkirin. Yek ji wan hate bidarvekirin û yên din hatin bibazdan. Mikavili xwe têde nedabû bibeşdarîkirin. Hadrian VI., Papayê dawîyî Elmanîyî hate bihelbijartin. Wî tanî 1523 date biserdarîkirin. Wergerandian Incilê bi Zimanê Elmanî ve ji bal Luther de hate biçapkirin.
- 1523 Clemens VII, yê ku ew ji Mala Midici bû û ew nala Sermetranê Giulio bi nav û bang bû, der vê salê de hate

bipapakirin. Wî tanî sala 1534 de date biserdarîkirin.

- 1524 Mikavili Yarîyakêfxweşiyê "Clizia" li ser nimûna Komîdya Plautus de didate binivîsandin. Yarîyakêfxweşiyê der sala 1525 de di temaşegaha Roma de hate biyarîkirin.
- 1525 Mikavili ji bona Roma hate biçûyîn, da ku ew xweşxwanên xwe li ser Florenz de ji bona Papa bide bipêşkeşkin. Ew ligel wî de li ser sazkirina Leşkerekî gelêrî de hate bipeyivandin. Papa ew ji bona nik Guiciardini date binardin, da ku ew ligel wî de li ser sazkirina Leşkerekî gelêrî de bide biaxivtin. Mikavili li Bajarê Florenz de careke din ji bona hemû karmendîyên dewletê dikare bête bihelibijartin. Ew ji bona Bajrê Vênêtsiya hate binardin, da ku ew li wêderê de li ser talankirina hinek Bazirganên Florenzî bide bireftarîkirin. Karlê V. di rêya biserkevtina wîna li nik Pavia de zalbûna Frensa li Italya de ji bona kakra Spanya date bişikenandin û wî Padîşahê Frensî Franz I. date bidîlkin.
- Jacob Fugger hate bimirin, yê ku ew Serbazirganê Augsburg û Bankvanê wêna bû û yê ku ew di rêya dana Kirîdîtên xwe de gelekî xurt ligel siyaseta wî zemanî de hatibû bitêkelkin.
- 1526 Hevalbendên Qeyserî li jêr Karlê V. de Florenz ber bi tirsê ve didan bixistin. Mikavili bi Serokê Karmendîya lêberxwedana Bajêr ve hate bikirin. Ew ji bona nik Guicciardini li Wargehê Hevgirêdana Lombardayi hate biçûyîn.
- Dawîya cenga pêşî di navbera Karlê V. û Franzê I. li ser Italya de Franzê I. ji Mayland, Burgund û Neapel hate bidakevtin.
- Cenga duwemê Karlê V. dijî Franzê I. date bidestpêkin. Reichstag -Perlema Imperatorî- li Speyer de ji bona

Mîrên Gundan helwesta beramberî Oldariyê ji wan re date bihiştin.

- 1527 Mikavili di pêşî de li dû Leşkerê Hevgirêdanê dida biçûyîn; di dûra de ew ji bona Civitá Vecchia hate biçûyîn, da ku ew Sipahsalarê Papa ji bona serrakişandina wîna ji bona ser Sipahên Qeyserê Elamnî bide bilivandin. Sipahên Qeyserî xwe ji bona nava Mayland û Roma didin bixistin û ew wan didin bitalankirin. Mala Midici di encamê şikestina Sipahên Frensiyan û Papa de hatin bikevtin. Mikavila nala Hevalbendên Midici ji hemû Karmendîyan hate biderkirin. Ew di 22. Hizêranê vê salê de bi temenkî 58 ve hate bimirin. Wî li piş xwe de mala xwe (ji Pîrekê, çar Kur û Keçekê) di perîşanîyeke pir gewre de date bihiştin. Ew di Kenîştá Santa Croce de hate biveşartin. Kêla Goristana wînanî nihayî der sala 1787 de ji bal Lord Cowperê Ingilîzîyî dildarê wîna de hate bidanîn. Ji bal vî Lordê hanê jî de ev nivîsta hanê li ser Kêla wîna de hatîye binivîsandin: "Tanto nomine nullum par elogium" -Mezibûna vî navê hanê tu pesindan nayê bipîvandin-.
- 1529 Di Damenfrieden -Aşîfîyaxatûnan- de li nik Kamberay de cenga duwem di navbera Karlê V. û Franzê I. de hate bipayînîkirin û Franz I. ji Italya hate bidakevtin. Turk di carapêşîn de dor û ber li Viyena de dane bigirtin. Ji bona Michelangelo çavdêrina li ser avanîkirina sengerên Florenz hate bisipartin. Florenz ji bal Leşkerên Qeyser û Papa de dor lê hate bigirtin.
- 1530 Papayê Clement VII. Karlê V. li Bologna date bitackirin. Ev bitackirina dawîyî Qeserekî Elmanî di rêya Papa de hate biderkevtin. Bajarê Florenz xwe date biberdestkirin. Ew di carapêşî de Yanesîbêperan dide biderxistin. Civinên Reichstag -

Parlemana Imperatorî- li Ausburg û li Confessio Augustana de hatin bikirin.

- 1531 Papayê Clemensê VII. di rêya fermana 23. 8. de ji bona Çapxana Antonio Blado bi çapkirina "Principe", "Discorsi" û "Mêjûwa Florenz" ve date bidestûrîkirin. Zwingli di şerê Kappeln de di berengarîya beramberî Urkatone Katolikî û Nemsawî de hate bikuştin. Aşîtyê belavkirina Reformation -Protistantîyê, Venuhkiriê- li ser tevaya Siwêstra de lê date bibergirtin.
- 1532 Di 4. çileyêpaşîn de çapa pêşîyî "Principe" ji Çapxana Blado li Roma de hate biderkevtin. Ji 1532 tanî 1540 de Nivîstok gelek carî ji bala Çapxanan de li Florenz û Vênêtsiya de hate biçapkirin. Der sala 1557 de ev Nivîsta hanê li ser Lista Qedexebûna Nivîstan de ji bal Papayê Paul IV. de hate bidanîn.
- 1535 Tomas Morus, Merovê Ingilîzîyî Dewletê û Merovanîyê jiber nesundxwarina wîna bi serê Padîşahê Ingilizî Heinrich VIII. ve, yê ku wî xwe ji bona Serokê Kenîştê dabû bikirin, hate biserjêkirin.
- 1580 "Principe" ligel "Nivîstên li ser Huneracengê" de di cara pêşîn de ji bona Zimanê Elmanî hatin biwengerandin.

Diyarî

Nikolo Mikayavili ji bona Şahzadeyê Lorenzo DE'Medci-Lorêntzo Dimidşiyê Mezin

Kî bixwaze hogirîya Mîrzayekî Serdar ji bona xwe bide buwergirtin, ew bi pêdana wîna ve bi giranbuhatirîn tiştinên malên xwe ve xwe ji bona nêzîkbûna wî dide birakişandin, yanî ew wî bi wan tiştan ve didin bidiyarîkirin, ji yên ku pê dilê wî bi wan ve têtê bixweşkirin; jibervêjî ew wî bi pirbûn ve bi hespan, çekan, pertelênbirokat, kevirêngiranbuha û xişran ve didin bidiyarîkirin, ji yên ku ew ji bona giringbûna cihên Serdar bi başî ve têtin bidîtin.

Jiber ku min jî xwest, ez jî ji bona Berzbûna we bi diyarîkê ve bi nîşana dilsozîya xwe ve ji bona we xwe bi we ve bidim binêzîkkirin, min di nava malên xwe de tişteki şêrintir û mezintir ji we re ji bil zanebûnên karên Mirovên Gewre pêve nedît, ji yên ku min ew di nava serpehatîya dirêj de ligel pêwendîyên dema me de û di rêya xwendekarîya hergav de ji bona pêwendîyên demên kevna ji xwe re dane biwergirtin: belê min di vê de gelekî bi dirêjî ve û pir liserxwe de lê date biremankirin û biezmonkirin û belê min ew di bergekî biçûk de bi hevdû re dane nivîsandin, yê ku ez wî ji bona Berzbûna we didim biberdestkirin. Tevîjî ku ez pê şiyarim, ku ev nivîsta hanê ji bona Berzbûna we bi xelatekê ve li gora we de nayête biderkevtin; lêbelê ez pê didim bibawerkirin, ku dê dilovanîya we wê bi mehrebani ve ligel guhpêdanekê de bide wergirtin; ku ji vê diyarîyê mezintir pê ve ji min nayête bikirin. da ku ez ji bona we pê karînekê bidim bipeyda kirin, ku hûn bi kurttirîn dem ve wan tevan ji xwe re bidin biwergirtin, ji yên ku min weha di nava pir salan de, di bin weha pir perîşaniyan û metirsîyan¹

¹Mebest di vir de ew perîşani û metirsî têtin bidîtin, yên ku wî ew der rêkirinên xweyî siyasî û balhozanî dane bidîtin. Balhozîyên ew ji bona Firensa, Elmanya, ji bona

de ji xwe re dane binaskirin û ew ji xwe re dane biwergirtin.

Ev nivîsta hanê xwe bêxemil dide biderxistin; di nava wê de ne gotinên qebe, nejî peyvên pir xemilandî û herwehajî nejî şelâfîyên xemilandî jî xwe didin bidîtin, ji yên ku bi wan ve pir Nivîskar nivîstên xwe pê didin biavzêrkirin; belê min xwest, ku bes û bi tenha ve navroka wê wê bide biavrûkirin û bes û bi tenha ve jî piralîyên bujena wêna û giranbûna danavên wêna başîya wê bidin biamojkirin.

Herwehajî ez naxwazim, ku ew nala payebûnekê bête bidîtin, gava ku Mirovek ji nava pêwendîyên¹ jêrîn û bindest jîrbûnê bide biderxistin, yê ku ew li ser pêrabûnên Hefsarvanê Dewletê de dide biaxivtin û yê ku ew rêzanan ji bona wî dide binivîsandin; belê mîna ku nigarvanên diyarênsêrûştîyê cihên xwe li binaran de didin bidîtin, da ku ew ji xwe re çêbûna çîyan û wargehên bilind bi başî ve bidin bidîtin û ew ji bona serên çîyan têtin bihilkişandin, da ku ew ji xwe re li çêbûna deştan de bi başî ve bidin meyzekirin. Wetov divê Mirov bi Serdar ve bête bidîtin, da ku ew navroka Milet ji xwe re bide bidîtin û werjî divê Mirovek ji Milet bête bidîtin, da ku ew ji xwe re navroka Serdar bide binaskirin.

Weha ez jiberzbûna we hêvîdarim, ku hûnê dê vê diyarîya biçûk bi mebesteke pak ve ji xwe re bidin biwergirtin, ya ku ez wê ji bona we didim bipêşkeşkirin. Gava ku Berzbûna we li ser wê de liserxwe de lê bidin biremankirin û wê ji xwe re bidin bixwendin, wisa hûnê dê têde daxwaza nava hinavê minî germtirîn ji xwe re bidin binaskirin, da ku hûn ji bona wê Meznahîya dildara xwe bêtin biserkevtin, ya ku bext û karinên we wê ji we re bidin pêşbînîkirin! Û hegerjî berzbûna we carcaran ji payebûna bilindbûna xwe ji bona jêrbûnan awiran ber bi xwarê ve bidin bivedan, wer dê hûnê bidin binasîn, bê ka ez çend bi bêgunehkarî ve her û her bedbextîyek mezînyî bext ji xwe re didim bihilgirtin².

nik Cesare Borgia û Serdarên biçûkî Itali datin bibirin, yê ku ew ji bona wan bi mehan ve di nava rêyan de dihate bidîtin. Ji giringtirîn karê wîyî siyasî-supahî serokîtîya wî ji bona Dorlêgirtina Pisa tete bidîtin

¹Karmendîya Mikavili jê hatibû bisitandin û ew di nava pêwendîyên perîşan de dihate bijîyandin.

²Ji xwe re li pêdeçûnê de bidin bitemaşekirin.

Derîyê Yekem

Hemû dewlet û hemû zordarî, yê ku wan zalbûn li ser Mirovan de didan bikin û yanî hêj ew didin bikin, ew bi xwe ve yan Dewletên Komarîne yanî ew Dewletên Padîşahîyê bi serê xwe ve têtin bidîtin. Padîşahîyên bi serê xwe ve Lidûxwehiştî ve têtin bidîtin, heger ku Zarwên Serdar ji mêj de ew didan biserdarîkirin, yanî heger ku ew ji bal Zarowên Serdar nuh hatine biwergirtin. Ji yê nuh hatine bisazkirin, yan bi carekê ve ew nuh tete bidîtin, mîna ku ev li Mailand -Mayland de ji bona Francesco Sforza -Fransisco Siforza¹- dihate bidîtin, yanî ew nala perçeyên dewletan ligel dewleta lidûhiştîyî Serdar de hate biyekkirin, ya ku wî ji xwe re dabû bivegirtin, mîna ku ev li Padîşahîya Neapel -Niapil- de ligel dewletên Padîşahê Sipanî² de

¹ Francesco Sforza (1401 tanî 1466)ew layê bi nav û bangê Condottiere Muzio Attendolo da Catinaola bû. Sforza (Bisergevtî)ew navê wîyî pêşi bû, yê ku Peyên wî ew pê dabûn binavkirin. Kurê wî Francesco Keça Doq Hplipp Maria Visconti ji Mailand ji xwe re date bimarîkirin. Der sala 1447 de wî li ber Mailand de beramberî Vinitsiyan de date bidan. Di rêya bêbextîya eşkereyî de wî alîkarîya wan Vênistîyan ji xwe re date biwergirtin, ji yê ku wî dixwest ew şerê wan bide bikin û wisa ew bi vî rengê hanê ve bi Mêrzayê Mailand- Mayland- ve hate bikin. Francesco Sforza ew nala Codottiere Kilasîyî sedsalê panzdehemîn dihate biderkevtin, yê ku wî di rêya pêrabûnê xweyî supahî de dikarîbû pê bihata bigihaştin, ku ew ji xwe re desthilatîyekê bide biafirandin.

²Ferdinadê Katolikî paymana Granada di 11. Çiriya Paşîn de der sala 1500 ligel Ludwig III, Padîşahê Firensî de, ji bona Hevalbendîtiya vegirtina Padîşahîya Neapel date bigirêdan. Hevgirtîyên Sipanî û Firensî bi lez û bez ve ew Padîşahîya hanê ji xwe re dane bivegirtin. Padîşahê wêna Friedrich -Firdrikê- Argon bi Dîl ve ji bona Firensa hate birêkirin, yê ku ew der sala 1504 de li wêderê de hate bimirin. Parvekirina talanîyê di navbera Hevalbendan de bi pevçûnan ve date bidestpêkirin û di dawî de bi

hate bikin. Ev deverên wer hatine bivekirin, yan ku ew hatine bireweştkirin, ku ew wer li jêr Serdarekî Padîşah de bêtin bijîyandin, yanjî ew hatine bireweştkirin, ku ew azad bêtin bijîyandin: Merov wan bi alîkarîya çekên Bêgane ve yanjî bi çekên xwe ve, yanjî wan di rêya bext de û yanjî di rêya jêhatbûna xwe de dide bivekirin.

Cengê ve ew hate payînkirin, ya ku tede Firensîyan li paş şikestinên cudan de welat datin biberdan û di dawî de Padîşahên Sîpanî der sala 1504 de ew ji xwe datin girtin. Ferdina ew bi welatê xwe ve nala Wênerêpadîşahîyekê date bigirêdan. Ji bona Mikavili Ferdinandê Katulikî ligel Francesco Sforza û Cesare Borgiya de ew nala Sedarekî bi nimûneyî ve dihatin biderkevtin.

Derîyê Duwem

Li ser Desthilatîyên lidûxwehiştî de

Ez li ser Dewletên Komarî de nema bêtir didim biaxivtin; jiber ku min li ser wan de li cihekî¹ din de bi dirêjî ve dayite bipeyivandin. Ez xwe bes û bi tenha ve ji bona ser Dewletên Padîşahîyên bi serê xwe ve xwe didim biwergerandin û ezê dê di wan rêstikên jorîyî dayîn de bidim biderxistin, bê ka çawan ew dê bêtin biserdarîkirin û bi bindest ve bêtin bixistin.

Di pêşî de ez didim biderxist, ku di nava Dewletên ligel rêzaneke Lidûxwehiştinê de, ji yên ku ew ligel Binemalên Serdarên xwe de bi hogirî ve têtin bidîtin, dijwarî ji bona bi cihkirina Serdar ve bi xwe ve gelekî kêmtir têtin bidîtin, mîna ku ew li nik padîşahîyên nuh vekirî de têtin bidîtin. Li vir de bes û bi tenha ve tete bitêrkirin, ku Serdar li ser rêyêserdarîkirinên Pêşîyên xwe de bête biçûyîn û ew xwe ligel pêwendîyên dema xwe de bide bikin; bi vî rengê hanê ve dê her Serdarek ligel tenêbûna nîvratsa karînan de her û her bikaribe xwe di nava dewleta xwe de bide biragirtin, heger ku dewleta wîna ne di rêya lihevraştatîneke ji rê derkevtî yanjî di rêya hêzdarîyeke jê pir xurtir ji nava destên wîna bête biderxistin; lêbelê dê ew serdarîya xweyî windakirî li nik biçûktirîn şasbûna Vekirvan de careke din ji

¹Di Discorsi sopra deca di Tito Livio de di navbera 1513 û 1519 de hatîyebi pêkhatin: Nivîsta I ya Discorsi û herwehaji Principe -Mîr- ji der sala 1513 hatine binivîsandin, lêbelê nivîsta Mîr hinekî ji nivîsta I hatîyebi wergirtin.

xwe re bide bivegerandin. Ji bona vê ji me re nimûyek di Italya de li ser Doqê Ferrara¹ de tête bidîtin, yê ku wî beramberî hêrîşên Xelkên Vênêtsiya der sala 1484 de û herwehaji hêrîşên Papa Julius der sala 1510 de bes û bi tenha ve xwe dikarîbû bida biragirtin; jiber ku malbata wîna ji kevnar de di nava vê devera hanê de dida serdarîkirin. Ji bona Serdarê cihî hoyê kê m û kê m zordarî ji bona sertbûnê tête bidîtin. Jibervêjî tête bidîtin, ku ew şêrîntir ji Talankerê Textekî ve tête biderkevtin, heger ku ew xwe ne di rêya gunehkarîyeke mezin de nede binefretkirin, wer bi berkevtî ve tête biliberkevtin, ku Jêdarên wîna hogirîyeke serûştî ji bona wîna didin mêldarîkirin. Di rêya kevnaryê û reweşt û rewenda Serdarîyekê de remanên li ser nuhkirinan û hoyên wan de dê bêtin bihilanîn; jiber ku her dem veguhertinek di nava dewletê de pêdana bi veguhertinên din ve dide bidan.

¹Di vir de Mikavili çavên xwe ji bona du Doqên Ferrara dayite biavêtin, yek ji wan Ercole d'Este (1471 tanî 1505) tête bidîtin, yê ku ew pircaran ji bal Vênitstyan hate bişikenadin û yê ku ew bi nasîna serdarkirina wan ve hate bineçarkirin, yê duwem bi Alfonso d'Este ve (1505 tanî 1531) tête biderkevtin, yê ku ew di cenga Girêdana Perest de ji bona demekê ji dar hatibû bixistin, lêbelê wî di dawîya dawî de xwe dikarîbû beramberî Papa Julius -Yulyus- II bide bigirtin.

Derîyê Sêyem

Di nava Desthilatîyeke biserêxweyî nuhvegirtî de bi servajî ve dijwarî têtin biderkevtin. Di pêşî de yekek weha tête bibîrxistin, ku ne bi carekê ve nuh tête bidîtin, lêbelê dewleteke vegirtî dê ew bi yeke din ve bête biservekirin. (Di vê rewşa hanê de Merov dikare giştîyê tanî radeyekî bi serdarîyeke tevlihev ve bide binavkirin). Di vir de veguhertin ji dujwarîyên serûştî de têtin biderkevtin, ji yên ku ew di nava hemû serdarîyên nuh de têtin biderkevtin: jiber ku Mirov bi dilxweşî ve bi wê baweryê ve dixwazin Mirzayên xwe bidin biveguhertin, da ku belkî di wê de rewşa xwe bidin bibaşkirin. Belê ew xwe didin bixapandin; jiber ku serpêhatî dide biderxistin, ku ji bona wan li paş de belê rewşa wan tête bibedkirin. Evaya bi rêkê ve bi serûştî û neçarî ve tête biderkevtin; jiber ku her Serdarek Jêrdarên xweyî nuh hergav divê bide bibirîndarkirin û evjî bi vegirtinên supahî û hezar zordarîkirinên din ve tête bikirin, ji yên ku vekirinek nuh bi xwe re dane bianîn. Wisa tu wan tevan ji xwe re bi dujmin ve dide bikirin, ji yên ku te ew ligel biserkevtina serdarîkirina xwe ve dane bizîyanîkirin. Herwehajî tu nikare ji bona xwe dostanîya wanan bide bihiştin, ji yên ku wan alîkarîya te ji bona wergirtina wê serdarîkirinê dane kirin; jiber ku tu hêvîyên wan tucarî nikare bi carekê ve bide bicîkirin, jiber ku tu dijî wan tucarî nabe pêrabûnên hovîtî bide bikaranîn; jiber ku beramberî wan tête bierkkirin. Dibe, ku Mirov pişta xwe jî bi supahekî xurt ve bide bigirêdan, wehajî Merov belê her û her niyazmendî hogirîya Neşînvanan tête bikirin, her ku Mirov ji bona nava welatekî bixwaze bête bikevtin.

Jiber vî hoyê hanê Ludwig XII Padîşahê Firensa¹ bi lez ve

¹Ludwig XII, yê ku wî li paş mirina Gian Galcazzo Viscontsi -Giya Galcazo

Mailand -Mayland- ji xwe date bigirtin, lêbelê wî wehajî zû careke din ew date biwindakirin. Di cara pêşî de hêzênçekarîyên Ludovico Sforzas -Ludovico Sforzas- dane bitêrkirin, ku ew ji bona wî bajêr careke din bidin bisitandin; jiber ku wan kesan bi xwe ve, yên ku wan ji bona Padîşahê Firensa dergeh dabûn bivekirin, wan xwe di hêvî û daxwazên xwe de xapandî datin bidîtin û wan zordarîyên di rêya Mîrzayên xweyî nuh de nema dikarîbûn bide bihilgirtin.

Belê bêgûman evaya rast tete bidîtin, ku welatên, yên ku ew piştî kevtina wan ji bona cara duwem têtin bivegirtin, ne weha careke din bi hêsanî ve têtin biwindakirin, evjî jiber vêjî tete bidîtin, ku kevtin wî welatî ji bona Serdar mehnakê dide bidan, ku ew desthilatîya xwe bêyê hîç dudulîyekê di rêya sizadana Gunehkaran de yanjî di rêya çavlêderîya Gûmanlêkiran de yanjî di rêya parastina cihên xweyî lawaz de dide bigirawkirin. Da ku Mailand -Mayland- careke din ji Firensîyan bête bisitandin, Doq Ludovico -Ludovico di cara pêşî de bes û bi tenha ve pê divabo bête birabûn, ku ew li ser sînoren Mayland de xir û cirê bide bidurustkirin; di cara duwem de Mayland ji bal Firensîya wê çaxê hate biwindakirin, gava ku wê tevaya cihanê dijî xwe date bidîtin û leşkerên wê hatin binabûdkirin yanjî ew ji Italya dane biderkirin¹. Evaya xwe ji hoyên jorîyîgotî dide biderxistin.

Viskonsi- de xwestîyên lidûxwehiştinê ji bona Mayland ji xwe re datin bikirin, di sibata sala 1499 de leşkerê di bin rêberîya Serleşkerê jêhatî Gian Giacomo Trivulzio -Giyani Giyakomo Trivulzio de ji bona Lombardi date binardin. Wî di 11. ilona sala 1499 de bi hevalbendîya Vênistiyanan ve Mayland date girtin. Doqê Mayland Ludovico -Ludovico- il Moro ji bona Elmanya ji bona nik Qeyser Maximiilan -Maksimilyan- date bibazdan. Maylandî bi zû ve ji Mîrzayên xweyî nuh ve hatin bidilxelandin. Wan ew dane biderkirin û wan Ludovico di 5. sibata sala 1500 de dane vegerandin. Di 5. nîsa wê salê de li paş devjêberdana wî de ji bal Peyên wîyî Siwisrî de ew ji bal Firensîyan di Vovars (Jorî Italyan) de hate şikenadin. Firensîya ew bi Dîl ve dane bigirtin. Ew der sala 1512 de di dîlbûna Firensî de hate bimirin.

¹Evaya di pêşî de di 1512 de der cenga binavkirîyî bi gêrêda perest ve hatîye bidîtin, ya ku ew ji bal Papa Julius -Yulyus- hate bisazkirin. Di nav vê girêda perest de Vênitsya, Padîşah Ferdinadê Aragon û Heinrich -Hayinriş- VIII Padîşahê Ingilistanê xwe hevalbend didatin bidîtin. Firensî li nik Ravenna de di 11. nîsana sala 1512 de hatin bişikenandin û ew ji Lombardi hate biderkirin..

Herçawajî Mayland di yekemîn û duwemîn car de careke din ji Firensîyan hate bisitandin. Hoyên giştî, bê ka çima ev di cara pêşîn de hate kirin, ez li ser wan de hatime biaxivtin; bes bi tena ve niha hêj hinek mane, ku wan hoyan bidin biderxistin, bê ka çima ev cara duwem hate bikirin û lêbidin gerandin, bê ka çî destikênalîkar ji bona Padîşahê Firensî liberdestê wî de dihatin bidîtin û bê ka çî destikên din ji bona Serdarekî din di wê rewşa hanê bi xwe de bi baştirîn ve dikarîbûn bihatana bikaranîn, da ku ew xwe baştir di nava bi destxistinên xweyî vekirî de bide biragirtin, ji mîna ku ew li nik Padîşahê Firensî de hate bigihandin.

Di pêşî de wer têtê bidîtin, magelo dewletên, yên ku Mirov di rêya vegirtinê de ligel cihêneşîniya xwe de dide bipêvekirin, yek welatî û yek zimanî ligel wê de didin bipêkanîn yanjî ew nadin bipêkanîn? Di rewşa yekem de ew pir bi hêsanî ve têtê bidîtin, ku Desthilatî têtê bête bihiştin, bi taybetî ve gava ku Neşîvanên wê nehatibûn bireweştîkirin, ku ew nala Neşîvanên azad bêtin bijîyandin; ji bona girawkirina bidestkevtina xwe ve têtê bitêrkirin, ku Malbata Serdarê berê bêziyan bête bikirin. Tude dê xwe bi aramî ve bidin biderxistin, gava ku Mirov ji bona wan rêstika kevnar bide bihiştin û rewştîkirinên jîna wan nede biveguhertin. Vê Merov dikare di nimûna Burgunds, Bretagne -Biretagne-, Gascogne -Gaskogne û Normandie -Normandî- de bide bidîtin, yên ku ew ji mêj de ligel Firensa de hatine biyekkirin¹; tevî ku cudabûna ziman jî lêbelê rewêstîyên jîyana wan mîna hev têtin biderkevtin û ew bi bê dujwarî ve xwe bi serhev ve didin bivekirin.

Kî dewletên wisa bide bivegirtin, divê ku ew du tiştan guh pê bide bidan, herger ku ew bixwaze wan ji xwe re bide bihiştin: 1. Divê

¹Vegirtina van deverên hanê di nava demên bi carekê ve cudan de hate bidîtin. Normandie -Normandî der sala 1204 de, Gascogne -Gaskogne- der sala 1453 de, Bourgonne -Borgogne- der sala 1477 de û Bretagne der sala 1491 de bi ser Firensa ve hatin bivekirin.

ku ew Malbata Serdarê berê bêzîyan bide bikirin, 2. nabe ku ew qanûn û bêşên wan bide biveguhertin; wisa di nava kurttirîn dem de ligel dewleta kevin de yekbûneke tevayî tête bipêkhatin.

Lêbelê gava ku Mirov dewletan di deverekê de dide bivegirtin, ya ku têde zimanekî din tête bipeyivandin, rewêşt û qanûnên din têde têtin bizalkirin, wê çaxê têde dujwarî têtin biderkevtin. Merov divê xwedan bextekî mezin bête bidîtin û gelekî jîrbûnê bide bikaranîn, da ku Merov wan ji xwe re bide bihiştin. Yekek ji baştirîn û bi kêrtirîn destik ve ew tête bidîtin, gava ku Vekirvan Wargeha xwe ji bona wêderê bide biveguhestin. Evaya dê Serdarîya wîna bide bigirawtirîn û bidirêjtirînkirin. Weha Turkan ev ligel Yunaniyan de dane bikirin¹; dê evaya tevî hemû pêrabûnan ji bona xwe girtina serdarîya wan nehatina bitêrkirin, heger ku Serdarê wêna wargeha xwe ji bona wêderê neda bibirin. Belê heger te li wêderê de wargeha xwe dabe bidanîn û te xir û cirên derkevtî li wêderê de datin bidîtin, weha tu wan bi lez û bez ve dikare bide bivetemirandin; belam heger tu li wêderê de neyête bidîtin, wisa tu bi derngî ve bi wan ve tête biagehdarkirin, piştî ku wan xwe dane bifirehkirin û ji bona temirandina wan tu destik nema bêtir têtin bidîtin. Hêjbiserdejî ve ew welataya jî ji bal Karmendên te nikare bête bitalankirin. Jêrdar bi dilxweş ve têtin bidîtin, gava ku ew Serdarê nuh li nêzîka xwe de didin bidîtin, jibervêjî dê ew pir caran zînetan bidin bidîtin, ku ew ji bona wî bidin bihezkin, gava ku ew bextiyar bêtin bidîtin û dê ew jê bêtin bitirsandin, gava ku ew wer neyête biderkevtin. Heger ku Desthilatvanekî Bêgane piçekî ji xwe re date bihezkin, ku ew welatekî wisa ji xwe re bide bihêrîşkin, weha dê ew li ber xwe de kelemên mezin bide bidîtin; jiber ku tanî Serdar li wêderê de bête biwargehkin, bes û bi tenha ve dê ew pir bi dujwarî ve ji nava destên wîna bikaribe careke din bête biderxistin.

Destikê duwemîbaştirîn di wir de tête bidîtin, di nava cihekî yanjî du cihan de Kolonîyan -Ayedanîyan- bidin biavakirin, yên ku ew

¹Di bin Yunan de Mikavili bi tevaya Balkan ve tête biliberkevtin, ya ku ew wirde wirde ji bal Bajazet (1347 tanî 1403), Murad II(1422 tanî 1451), Muhemed II (1451 tanî 1481) û Selim (1467 tanî 1520) hate bivegirtin; bi vegirtina Konstantinopels -Istenbol- der sala 1453 de Şahînsahîya -Selteneta- Turkan xwe di nava Ewropa de date bidamizirandin.

nala Bendan di nava wî welatî de didin bikêrkirin. Mirov divê vê bide bikirin, yanjî divê Mirov hêzeke xurtî dagîrvan li wêderê de bide bihiştin. Kolonî perê kê m didin bibextkirin; Mirov wan dide bisazkirin û wan bi carekê ve yanjî bi kê m lêbextkirina peran ve dide biparastin û Mirov bes û bi tenha ve li wan Kesan de pê dide biziyanîkirin, ji yê n ku Mirov zevî û xanîyên wan dide bisitandin, daku Mirov wan ji bona Wargehvanên nuh dide bidan; belam evanan bes û bi tenha ve perçeyekî biçûk ji Welatê vegirtî didin biderxistin.

Jiber ku ewanan, yê n ku di vê rêya hanê de beramberî wan sitembarî hatîye bikirin, di nava tevaya welêt de belavkirî têtin bineşînîkirin û ew di nava perîşanîyê de têtin bijîyandin, ew nikarin tucarî li Serdarê nuh de bidin biziyanîkirin. Hemû Neşînvânê n din bi vî karî ve pê nayêtin biêşandin, (di encamê vê de ew dê xwe bi aramî ve bidin bihiştin) herwehajî dê ew xwe ji tirsan ji her serhildanekê bidin bidûrkirin, da ku ew bextê wan Kesan ji xwe re nedin bihilgirtin, ji yê n ku têtin bitalankirin. Ez ji vê encamê didim biwergirtin, ku Kolonîyên weha tu perebextkirin din nadin biderxistin, pir bi wan ve pişt têtê bigirêdan û ew ji bona Tude bi kê m ziyânî ve têtin biderkevtin.; herwehajî Biserpêhatîvanên wan nikarin ziyanan bidin bikirin, jiber ku ew bi perîşan ve têtin biderkevtin û ew di tevaya nava welêt de bi belavkirî ve têtin bineşînîkirin, ya ku min berî niha ew dabû binîşankirin.

Mirov divê jibervêjî ji xwe re bide bibîrxistin, ku Mirov divê ligel Mirovan de bi dostanî ve bide bireftarkirin yanjî divê ku ew wan bêziyan bide bikirin; jiber ku ew beramberî her birîndarbûneke biçûk tola xwe didin biwergirtin, belam beramberî ziyânê n giran ve ew nikarin tola xwe bidin biwergirtin. Wisa heger ku Mirovekî ligel Mirovekî din de bi bedî ve date rbieftarkirin, wêçaxê divê Mirov vê bi şêweyekî ve bête bikirin, ku Mirov ji tolwergirtina wîna pêwistî tirsandinê neyête bikirin.

Heger Mirov li şûna wargehên nuh de supahekî dagîrkerî bide bixwedîkirin, wer evaya bêtir giranbuha têtê biderkevtin; Mirov bi hemû hatinê n dewleta vegirtî ve ji bona çavdêriya wêna pê têtê pêwistkirin. Weha dagîrkirina wêna bes û bi tenha ve ziyânê dide bianîn; Mirov hêjî bi pirî ve bêtir tûrebûnê bi ser ve dide bivekirin, jiber ku Mirov di rêya veguhestinê n wargehên hergavîyî

supahêdagîrkerî de tevaya welêt pê dide biêşandin; vêna her yek nala barekî dide bidîtin û weha ew dê ji bona Mêrzayê xweyî nuh bi dujmin ve bêtin bikin; bi rastî jî ve dê ew bi dujminên wî rastteqînê jî ve bêtin bikin, yên ku ew dikarin pê ziyane bidin bigihandin, jiber ku ew bi rastî ve hatine biliberketin, belam ew hêjî di nava pêwendîyên xweyî kevin de têtin bihiştin. Bi her bidîtinekê ve jîbervêjî ev şeweyê çavdêriyê wer çend ew bi ziyane ve bête biderkevtin, weha ew di rêya koloniyane de bi qenctir ve tete biderkevtin.

Serdarê welatekî bi qanûn, rabûn û rûniştinên jîneyî din ve -li jor de li ser wan de hatîye biaxivtin- divê ew xwe bi Mezin û Liberxwedanvanê Dirwseyên Lawazan ve bide bikin. Ew divê herwehaji liberkevtî bête bidîtin, ku yên xurtirîn di nava van de bide bilawazîkirin, hêjî dûrtir divê ku ew ji xwe re bide bipêşbînîkirin, ku ne ji bona rûdanekê Desthilatvanekî bêgane ji bona wêderê dide bihêrîşkirin, yê ku ew wetov xurt mîna wî bi xwe ve tete bidîtin. Yekekî wisa dê ew hergav ji bal wanan de, yên ku ew ji pîrbûna mezinî avrûwê de yanjî ji tîrsan de hatine biazarkirin, ji bona nava welêt bidin bibangkirin: Weha Atoler¹ Roman ji bona Yunanê dane bibangkirin; li kuderê de hargava vanan didan bihêrîşkirin, ew ji bal Tudeyên welêt ve dihatin bibangkirin. Evaya bi reweştî çûna tiştan ve

¹Atoler -Êtoler- di nava Yunanê de bi kêma desthilatî ve dihatin biderkevtin; Philipp -Filip- V. Xurtî ji Makdonya û Antiochus -Antiyoxus ji Sûrî bi xurtîna Serdarên bêgane ve dihatin biderkevtin. Roma xwe bi Rêber ve date bidanîn û wê xwest, ku ew li ber Êtolerîyan de bide bidan. Wê xwe ji bona şerê Filipê V. ji Makdoyan date birakişandin û wê ew date bişkenandin. Li paş de Romanan xwe ligel wî Filipê hanê de bi xwe ve diji Antiyoxusê Sûrî de datin hevalbendkirin, yê ku ew ji bal Êtolerîyên tûre ji jêdarîya Romanîyan ji bona nava welêt hate bibangkirin. Antiyoxus ceng diji Romanîyan, yên ku li aliyê wan de Hevalbendîya Achaisch -Aşaîş- û Filipê Makdonî di hate bidîtin, date bilidarxistin. Ew di berangarîya şerê nêzîka Thermopylea -Têropîlia- de der sala 192 berî zayîne de hate bişkenadin û ew ji bona Sûrî hate bibazdan. Wî di şikestineke din de li nêzîka Magnasia -Magnasya- de der sala 190 berî zayîne de perçakî mezin ji Şahîşahiya xwe ve date bidûrandin.

Bi vî rengê hanê ve di pêşî de Romanîyan kêma desthilatên Êtoler dane piştgirtîkirin, xurtin wan dane lawazkirin û ceng ligel Serdarên Bêgane de dane bilidarxistin.

tête bidîtin, ku hemû kê m Xurtvanên welatekî ji bedreftariyê de dijî Biserketvanê xweyî berê bi lez û bez ve xwe bi ser Vegirtvanê bêgane ve didin bigirêdan. Van kê m Xurtvanan bidin bikarkirin, ew ji bona Vegirtvan tu dujwariyêke taybetî nadin bidurustkirin; jiber ku di cih de ew hemû bi hev re bi dildarî ve ligel dewleta biserkevî de hevkarîyêke bi hev re didin bikirin; ew bes û bi tenha ve divê guh pê bide bidan, ku ew ne bi pirî ve desthilatîyê û kêrê ji xwe re bidin bipeydakirin; ew dikare li paş de bê dujwarî ligel hêzênçekdarîyên xwe de û ligel mêdariya wan de Desthilatvanên xurt bide biserjêrîkirin û ew bi Mêrzayê de vera vegirtî ve bête bihiştin.

Kî vê rola hanê ne bi jîrdarî ve bide biyarîkirin, dê ew bi pele ve bide bidûrandin, çî ya ku wî ji xwe re dabû bivegirtin û dê ew, tanî ku ew wî welatê vegirtî di nava destên xwe de bide bidîtin, li wêderê de dujwariyên bêjimar û liberkevîyan ji xwe re bide bidîtin.

Romanîyan di nava hemû welatan de, ji yên ku wan ew dabûn bivegirtin, bi vê rêzana hanê ve bi carekê ve rast û durust didan biguhpêdan. Wan ji bona nava wan welatan Kolonî dane biavanîkirin û wan li ser xwe de beramberî kê m Desthilatvanan de dane bierkkirin, bêyî ku hêza wan bête bibêtirkirin, wan Desthilatvanên xurt serjêrkirî dane bihiştin û wan ji bona Desthilatvanên derve hîç tu rê ji bona kêra wan li ser Neşînvanan de nehiştin bêtin bidîtin. Wer ji bona min de vera Yunanî mîna yek nimûneyî di vir de bête bitêrkirin. Achæer û Âtoler -Aşêer û Êtoler- ji bal Romanîyan ve hatin bipiştgirtin: Padişahiya Mazedonier -Makdonîyan- hate bipîskirin¹, Antiochus -Antiyoxus- jê hate biderkirin²: lêbelêjî karên başî Achæer û Âtoler³ tu

¹Der berengariya Cynoscephalae -Kinoskefalae- de Padişah Filipê V. Makdonî (221 tanî 179 B.Z.) ji bal Konsulê Romanî Titus Qu. Flaminius der sala 192 b. z. de hate bişikenandin.

²Antiochus Antiyoxus-III Padişahê Sûrî (223 tanî 187 b. z.) der sala 192 ji bal Êtolerîyan ji bona nava Yunaên hate bangkirin û ew ji bona wêderê de hate bicûyîn. Ew der berengariya xwe de ligel Romanan de li nêzîka Magnesia -Magnêsyâ- de di Asya Biçûk de der sala 190 b. z. de hate bibezandin.

³Achæer -Aşêer- û Êtoler ji bal Romanîyan bi başî ve dihatin biparastin; lêbelê wan berê desthilatîya wan nedan bimizinkirin.

caran ber li Romanîyan de nedane bigirtin, ku ew ji bona vanan firehkirina berê desthilatîya wan nedin bihiştin; herwehaji peydarîyên hunerîyî Philipps -Filips-¹ ji bona wan tu carî ew pê nehatin bikêrkin, ku ew ligel wî de dostanîyê bidin bigirêdan, bêyî ku ew wî pêrejî di wêdemê de bidin bisînorkirin; herwehaji Antiochus -Antiyoxus tevî xurbûna hêza wî jî nikarîbû destûra wan ji xwe re bide bigirtin, ku ew wê devera ji bal wan de vegirtî ji xwe re bide bihiştin. Romanîyan di nava van rewşên hanê de ew dane bikin, çî yên ku hemû jîrdarên Serdarên Dewletan divabûn bidana bikin: wan nebes tenê divabûn ku ew li metirsîyên çavbînîyê de bidin biguhpêdan, lêbelê jî ji bona wan divabûn ku ew li metirsîyên ayinde jî de ber bidin bigirtin û ew van bi hemû tîna ve bidin birûbirûkirin; jiber ku Mîrov belê dikare wî bide bisaxkirin, ji çî yê ku Mîrov wî bi dirêjî ve dide bipêşbînîkirin; belê tu dide bibendewarîkirin, tanî ku derd di te de dide bitengavîkirin, wê çaxê hîç dermanek nema bêtir dijî wî tete bidîtin, jiber ku nexweşî nema dikare bête bisaxkirin.

Werjî bi xwe jî ve ev mîna der nexweşîya zirav de tete biderkevtin, ya ku li ser wê de Bijîşkvan didin bigotin, ku ew di destpêkaqonaxê de bi hêsanî ve tete bisaxkirin û ew bi dujwarî ve tete binaskirin; lêbelê di pêşketina qonaxê de ew, heger ku Mîrov ew di despêkê de neda binaskirin û ew neda bisaxkirin, bi hesanî ve tete binaskirin û ew bi dujwarî ve tete bisaxkirin. Wehaji ev ligel siyasetê jî de tete biderkevtin; Mîrov derdan, yên ku ew di nava dewletê de têtin bikatkin, berî bi demeke dirêj ve dide binaskirin, bi serûştî ve ji bona vê nasîna hanê bes û bi tenha ve seryekî jîr dikare bide bikin, weha dê ew bi lez û bez ve bêtin bipakkirin; lêbelê gava ku Mîrov wan nede binaskirin û ew xwe weha li dor û berên xwe de bide bivegirtin, tanî ku her yekek pê dide bihestkin, wê çaxê tu derman bêtir nema dikarin beramberî wan bidin bialîkarîkirin. Jîbervêjî gava ku

¹Filip V. xwe bi Romanîyan ve ji bona xebata dijî Antiyoxusê Surî ve date bigirêdan; lêbelê wî divabû cihên bidestkevtîyên xwe di wê cenga hanê de bide bizîvirandin, jiber ku Romanîyan bi tucorê ve mezinkirina welatê wî nedihîştin bête bikin.

Romanîyan pêşbînîya tirsan didan bidîtin, wan hergav hêrîşî ser wan didan bikin û wan pêşkevtina wanan nedihîştin tucarî bêtin bikin, da ku ew bes û bi tenha ve ew xwe ji cengekê bidin biparastin; jiber ku wan didate bizanîn, ku ceng tucarî nayête bihilanîn, lêbelê hergav bes û bi tenha ve ew ji bona kara Dujmin tête bidergîxistin; jibervêjî wan wisa dane bikin, ku ew ligel Philipp -Filip-¹ û Antiochus -Antiyoxus-² de di nava Yunanê de bidin bicengkirin, da ku ew ligel wan de ne li Italya de neçarî şer bêtin bikin. Wan dikarîbûn wêçaxê xwe ji herdu cengan bidin bidûrkirin; lêbelê wan bi wê gotinê ve nedane bikin, bi vê gotinê ve, ya ku heft Jîrvanên dema me her roj di nava devên xwe de wê dibin û tînin: dem tê, amojgarî tê (bi peyv ve: xweşîya demê ji xwe re binoşin), wan tu guh pê nedan bidan, wan bes û bi tenha ve biserkevtin di jêhatbûna xwe de û di jîrbûna siyaseta xwe didan biçavdêrîkirin; jiber ku dem her tiştên li ber xwe de dide bimalandin, ew dikare başbûnê mîna bedbûnê û bedbûna mîna başbûnê bide bianîn.

Belê em xwe ji bona ser Firensa bidin zîvirandin û lêbidin bikolandin, bê ka ma wê jî bes li pey yekekê ji wan bingehên binavkirî de hatîye biçûyîn. Ez dixwazim di vir de li ser Ludwig -Ludvig-³ de û ne li ser Karl⁴ de bidim biaxivtin; jiber ku vîna xwe demekê dirêjtir li Italya de daye bihiştin û jibervêjî karên wî baştir li ber çavan de dikarin bêtin biwergirtin. Dê hûnê bidin bidîtin, ku wî bi xwe ve servajî wî karî dida bikin, yê ku Mirov divabû ji xwe re bida bikin, da ku Mirov desthilatîya xwe di nava welatekî birengêkî dinî bi carekê ve bide biragirtin.

Padîşah Ludwig -Ludvig- ji bona nav Italya di rêya dilbijandîna deshilatîyê de ji bal Venêtsiyanan de hate bibangkirin,

¹Di cenga Makdoniyî duwem de ji sala 200 tanî 197 b. z. de.

²Di cenga Suriyî-Êtolî de ji sala 192 tanî 191 b. z. de.

³Ludvig III Padîşahê Firensa 13 salan ji sala 1499 tanî 1512 li Italya de bû; Wî di cengê de ligel Yulyus II de xakên xwe li Italya de dane biwindakirin.

⁴Karl III bes û bi tenha ve li Italya de ji Ilona sala 1494 tanî çiriya pêşîna sala 1495 de hate bimayîn.

yên ku wan qazanca nivê Lobardei -Lobardi- di rêya hêrişê wî de ji xwe re didan bihêvîkirin. Ez naxwazim li biryara Padîşah de bidim birexnekirin. Jiber ku wî carekê di Italya de xwestibû pîyên xwe bide bicîkirin û ji bona wîna di nava vî welatê hanê de hîç Dostek nehate bidîtin, libelê biservajîvêjî jiber helwesta Padîşah Karl¹ wî hemû dergeh li ber xwe de dadayî datin bidîtin, ew hate bineçarîkirin, ku ew ligel her hevalbendîyekê de xwe pê dide binêzîkirin, ew xwe pê bide bigirêdan. Ev pêrabûna bi başî ve lêhatibû biremankirin, dikarîbû ew bihata biserkevtin, heger ku wî ligel pêrabûnê xweyî din de tu şaşbûnê din nedana bikirin. Li paş vegirtina Lobardei -Lobardi- de Padîşah xweser careke din navbanga başî ji bona Firensa date bikarkirin, ya ku ew ji bal Karl ji bona Firensa hatibû biwindakirin: Genewa xwe date biberdestkirin², Florentiner -Filorensî- bi dostên wî ve hatin bikirin³; Marches -Marşêz- ji Montau -Montaw⁴-, Doqê

¹Karl III bigir tevaya Italya bi Dujminên Firensa ve dabû bikirin.

²Komara Genewa di navbera du partîyan de partîya Xanedanan û partîya Gel de hatibû bidutakirin. Xanedanan xwe bi ser Ludvigê II ve û Gel xwe bi ser Papayê Yulyusê II ve, yê ku ew bi dujminekî tundî Firensa ve dihate bidîtin, didan bikirin. Ludvid xwe ji bona nava bajêr date birakişandin û wî Rêberên Partîya Gel dane binabûdkirin. Wisa bi vî rengê hanê wî dikarîbû bajêr bi bindestên xwe ve bide bixistin.

³Filorensiyaniyan divabûn Ludvig XII bi çek û peran ve der hêrişê wî de ji bona Neapel -Niyapil- bidin piştgirtin, herwehaji Padîşah ji aliyê xwe jî divabû piştê Filorensiyaniya ji bona bindestkirina bajarê Pisas bide bialîkarîkirin.

⁴Herwehaji Giovanni -Giyovanni- Farnesco -Firansisko- Gonzaga Mêrê Isabella -Isabilayî Este, yê ku wî jî dijî supahên Kals III dabû bişerkirin, ji bona xwe bi nêzîkirina Ludvig XII ve dida bikarkirin û xwe bi Firensa ve date bigirêdan. Di van Peyên wî de herwehaji Baldassare Castiglione -Kastigliyonê dihate bidîtin, yê ku ew li "Contigiano" -Kontiyano- de di dîtina Gonzaga ligel Padîşahê Firensî de dide bibîrxistin.

Ferrara¹, Bentivoglio -Bentivogliyo², Xatûna ji Forli³, Mêrzayên ji Faenza⁴, ji Pasaro⁵, ji Rimini⁶, ji Camerino -Kamerino⁷, ji Piombin Pombino⁸, ji Komarên Luca -Loka-, Pisa, Siena -Siyena⁹, wan hemûyan serdardanîya wîna dane bikirin, da ku ew ji xwe re dostanîya wîna bidin biwergirtin. Niha Venezianer -Vênitsiyaniyan- dikarîbûn xwe li ser remana helwesta xweyî xav de bidin bironahîkirin: da ku ew du bajaran di Lombadri de ji xwe re bidin bikarkirin, wanan Padîşahê Frensi ji bona perçê sêyemî Italya dane bimîrzakirin.

Mirov divê belê bête biliberkevtin, bê ka dê çend hêsanî ji bona Padîşah bihate biderkevtin, da ku wî kêra xwe di nava Italyan de bikarîba bida biragirtin, herger ku wî ji bona ser wan bingehênremanên jorî de bida biçûyîn û wî ji bona Hevalbendên xwe bida bigirawkirin û biparastin, ew belê pir bi jimar bûn, belam ew bêhêz bûn û ew her û her bi tirs bûn, geh ew ji kenîştê û gehjî ew ji Vênitsiyanan dihatin bitirsandin, jîbervêjî ew divabûn bi bê veger ve

¹Ercole -Erkole d'Este

²Giyovanni Bentivoglio -Bentivogliyo- Mêrzayê Bologna, yê ku ew bi tundî ve ji bal Papa Yulyus II de dihatê bişerkirin.

³Bi nav û banga Caterina -Katerina- Şahzadeya Imola û Forli û ew dêya Giyovanni delle Bnade nerre bû.

⁴Astorre Manfredi.

⁵Giyovanni Sforza.

⁶Pandolfo Malatesta.

⁷Giulo -Giyulo Cesare -Qeyser- da Varano.

⁸Jacopo -Yakopo- degli Appiani -Appyani-. Ne ji bon tevan piştgirtina Firens bi kare ve dihatê bidîtin: Antrorre Manfredi û da Varano ji bal Cesar -Qeserê- Borgiya, yê ku ew ji bal Firensîyan dihatê piştgirtin, hatin kuştin; Giyovanni Sforza, yê ku ew Mêrê pêşiyî Xanima Lucrezia -Lukretisiya Borgiyas bû, dewleta wî jê hate bitalankirin.

⁹Luca -Luka-, Pisa û Siena -Siyena dewletên azadbûn.

xwe bi ser rexê Padîşah ve bidin bivekirin; di rêya wan de dê wîna bi hêsanî ve xwe dijî Dirwasên xurtî mayîn bikarîna bida biragirtin. Belam hêji bigir pêyên wî bi Mailand -Mayland- ve nehatibûn bikevtin, wî di wêçaxê de bi ser vajî wê date bikirin, gava ku wî ji bona Papa Alexander -Iskender¹ der vegirtina Romagna de date bipiştgirtin. Ligel vê birayra hanê de di ser wî re hate biderbaskirin, ku xwe bi xwe ve date bilawazîkirin, gava ku wî bi wê ve Hevalbendên xwe û ew hemû dane biwindakirin, ji yên ku wan xwe pê ve dabûn bigirêdan. Hêjîbêtir ku wî keniteş date bixurtkirin, gava ku wî bi ser hêza wêyê rewanî ve, ya ku ew jêre jiberê de weha desthilatîyê dide bidan, hêjîbêtir hêzeke dunyayî weha giring di nava destên wê de date bikomkirin. Belê li paş ku wî şaşbûna pêşî date bikirin, ew hate bineçarîkirin, ku ew di wî berî de bête çbiûyîn. Da ku ew payebûna Alexander -Iskender- bide bisînorkirin û ew wî ji bona vegirtina Toscanas -Toskana- bide binehiştin, wî li ser xwe de neçar date bidîtin, ku ew bi xwe ji bona Italya bête bihatin.

²Ludvigê Duwazdehemîn li paş rakişandina xwe ji bona ser Mayland de nav û nişeneke mezin ji xwe re di Italya de date biwergirtin. (Ji xwe re li deriyê sêyem de bidin bitemaşekirin).

³Alexander -Iskenderê Papayê- Şeşem, di bin mehna ku Mirzayên Romagna û Marken -Markên- deynê kenîştêyê ji xukitiya li ser wan de nadin bidan, Kurê xweyî Cesare -Sêsarê- date bifermandikirin, ku ew wan bide bisertewandin. Wî di navbera çiriyapaşîna sala 1499 û çileyê paşînî sala 1500 de Imola û Froli dane bisertewandikirin, wî di çiriya pêşîna sala 1500 de Pesaro û Rimini dane bisertewandikirin; wî di navbera nisanê û ilona sala 1501 de Faenza û Piombino -Piyombino- dane bisertewandikirin, der meha hizêrana sala 1502 de wî Urbino û li paş de jî Sinigaglia -Sinigaglia- dane bivegirtin, gava ku wî der çileyê pêşîn de Serokên Xelkên xweyî li ber rabûyî de dane bikuştin. Der sala 1503 de wî Perugia -Perugya- date bivegirtin.

hate bidiyarkirin, ku Sipahên Orsini di hêrîşa xwe de bi bê dilê xwe ve bi pêş ve diçûn. Herwehajî wî mebesta¹ Padîşah ji xwe re date binaskirin, gava ku wî piştî vegirtina Doqîtîya Urbino ji bona Toscana -Toskana- date bihêrîşkirin²; Padîşah ji bona pêrabûna vî karê hanê rê li ber date bigirtin, ji vir û pê Doq ji xwe re date bibiryardan, ku ew xwe ji çek û bextê yên din bide birizgarîkirin.

Di pêşî de wî partîyên Orsini û Colonna -Kolonna- li Roma de date bilawazkirin; wî hemû Hevalên wan bi ser xwe ve dane birakişandin, ji yên ku ew Xanedan bûn, wîna ew ji bona nava karên xwe dane bixistin, wîna ji bona wan diravên salaneyî pir dane danîn û wî ew bi karmendîyên bilind ve dane bixelatkirin û wî ji bona heryekî ji wan li gora karîna wîna de bi Serdarê Sipah û şûnênserdarîkirinê dane binavkirin. Wisa bi vî rengê hanê ve di nava çend mehên kêma de pêwendîyan wan ligel partîyên wanî kevnar de hatin bibirîn û ew hemû ligel Doq de bi dost ve hatin bikirin. Li paş vê de wî çavdêrîya kêsekê ji xwe re dida bikirin, da ku ew Maqulên Orsiniyan bide binabûdkirin, li paş ku wî Maqulên ji Mala Colonna -Kolonna- de ji hev dane bitarûmarkirin. Vê kêsekê hanê xwe jêre bi başî ve date bideranîn û wî ewaya hêjbêtir bi baştir ve ji xwe re date bikaranîn. Gava ku Orsiniyan li paş de pê dane bihestkirin, ku gewrebûna deshilatîya Doq û dewleta Kenîştê bi nemana wan ve tete biderkevtin, wan civînek li bajarê Magione -Magyonê- de li nik Perugia -Prugya³-

¹Ludwig Duwazdehemîn wirde wirde bi rabûna kar û barên Cesare -Sesarê- ve pê hate bişiyarkirin, gava ku vîna xwest, ku ew xwe ji bona ser Florenz -Florentsê- bide birakişandin. Ludwig diji vê ser rakişandina hanê dengê xwe date bibilindkirin, jiber ku ew ligel Florenz -Florentsê- de Hevalbend bû.

²Xweser li paş vegirtina Urbino de, ya ku ew li jêr serdarîkirina Guidobaldo -Guyidobaldo- Montefeltro de dihate bidîtin, Mikavili nala Balyozê Flronts ji bona nik Cesare Borgia -Sesarê Borgya- hate bidanîn. Di wî raportê xwe de ji bona serokê karmendîya xwe di 26. axlêva sala 1502 de ew bi dilgermî ve li ser siyaset û kesîtiya Sesarê de dide biaxivtin.

³Magione -Magyonê- ew gundekî li nêzîka Prugya de tete bikevtin. Li wêderê de der 9. çiriya pêşîna sala 1502 de Orsini, Sermetranê Pagolo, Fermanrewayê Gravina, Vitellozzo Vitelli, Oliverotto da Fermo, Giampagolo Baglioni -Giyampagolo Bagliyoni, hêjbêtir Wênerekî Pandolfo Petrucci, Mirzayê Siena -Siyena- û hinên din xwe ligel hevdu de datin bicivandin. Wan li ser bernameyên Fermanrewayê şesarê

de dane bikirin. Ji wir serhildana Urbino, herayên der Romagna de û metirsîyên bêjimar ji bona Doq serên xwe date bidestpêkirin; bi ser van tevan ve ew bi alîkarîya Firensîyan ve hate biserkevtin¹.

Careke din nav û nîşana wî xwe date biberzkin; lêbelê wî tu bawerî ne bi Firensîyan û ne jî bi Desthilatîvanên dînyî Bêganê ve dida bikirin. Jiber ku wî nikarîbû ew bidana biceribandin, wîna ligel wan de bi konîfî ve date bireftarkirin. Ew weha bi başî ve dihate biliberkevtin, ku ew mebesta xwe bide biveşartin, ku Orsiniyan li ser destên Paolo Orsini² ligel wî de bêtin bilihevhatin. Beramberî vanan de Doq her tişt date bikirin, ku ew bawerîya wan bi xwe ve bide bianîn; jiber vêjî de wî pir rêz li wan de dida bigirtin û wî ew bi peran, cil û bergan û hespan didan bixelatkin. Dilpakîya Orsiniyan wer mezin dihate bidîtin, ku ew xwe li Sinigaglia -Sinigaglia- de di nava lepên wî de bidin bidîtin³. Piştî ku Doq Maqulên wan dane nabûdkirin

dane biaxivtin û wan dane bibiryakin, ku ew birçîbûna wîyi desthilatîyê bidin bigemkin. Wan bi her awayekî ve didatin bixwestin, ku ew ji xwe re Florents bidin bikarkirin.

¹Der 17. çiriyê pêşîna sala 1502 sipahên wî ji bal Orsini hatin bişikenandin. Cesare - Sêsarê- xwe bê sipah li Imola de dida bidîtin û divabû ew wêçaxê bête bitirsandin, ku ew bicarekê ve bi bêçekî ve divabû cengê bide bikirin. Di vê deqadema hanê de Mikavili ji bal Florentsiyan de ji bona bal Sêsarê hate binardin, da ku ew di hewara wî de beramber bi Dujminên wî nuh ve bêtin hatin. Vênitsiyan jiber dujiminatîya malbatîyê kevin de dane bibiryakin, ku ew Orsini û Vitelli nedin bipiştgirtin. Belê careke din Sêsarê bi ser xwe ve hate bikirin, wî sipahên nuh ji xwe bi serhev de dane bivedan û wî ji Padîsahê Firensî piştgirtin date bihêvîkin. Padîsah jê re 500 Suwarên Rimbaz dane bilidarxistin.

²Paolo Orsini di 25. çiriyê pêşîna sala 1502 de ji bona Imola hate biçûyîn, da ku ew ligel Sêsarê de aşîyê bide bigiredan.

³Der 31. çileyê pêşîna sala 1502 de Sêsarê fermana kuştina Maqulên Vitellozzo û Oliverotto date biderxistin, yê ku wan xwe jê dabûn bidûrkin; herweh jî wî Paolo Orsini û Fermanrewayê Gravina der 18. çileyê paşîna sala 1503 de dane bikuştin.

û Hevalên wan bi Dostên xwe ve dane bikirin, wî hîmekî zor baş ji bona desthilatîya xwe afirandin; jiber ku wî niha tevaya Romagna ligel Doqîtiya Urbino de ji xwe re dida bimalkirin; herwehaji wî dikarîbû ji xwe re bida bibawerîkirin, ku ji bona wî bi taybetî ve tudeyên Romagna bi dilsoz ve têtin bidîtin. Weha bi vî corê hanê ve wî teva dilsozîya Milet ji xwe re date bikarkirin; jiber ku wan di cara pêşîn de li jêr serdarîkirina wîna de bextiyariya xwe ji xwe re datin bidîtin.

Jiber ku ev pêrabûna hanê bi hêja ve tete bidîtin, divê ku ew bête binasîn, da ku mîna wêna bête bikirin, ez dixwazim, ku ez li ser wê de bêtim birawestandin. Piştî vegirtina Romagna Doq date bidîtin, ku evaya ji bal Mîrzayên bêkarîn dihate bizalkirin, yên ku wan wisa Jêrdarên xwe didan bitalankirin, nala ku wan ew didan bizindankirin û wan bes û bi tenha ve ji bona duberîyê û ne ji bona yekitîyê didan bikarkirin. Jibervêjî di nava vî welatê hanê de talnkirinê, raw û rûtkirinê û her rengê zordariyê xwe didate bifirehkirin. Wî bi niyazmendî ve date bidîtin, ku ew ji bona vî welatê hanê serdariyeke baş bide bidan, da ku ew wê careke din bide biaştîtkirin û ew wê ji bona desthilatîya serdariya xwe bide bipêrûniştîkirin. Jibervêjî wî Mîrza Ramiro de Orco -Orko¹, yê ku ew Mirovekî zordar û bi lezleberkevî dihate bidîtin, nala Ostandar bi desthilatîyên gewre ve date bidanîn. Vî di demeke kurt de aramî û yekitî careke din date bicîkirin û wî di vê rêyê de ji xwe re baştirîn nav û bang date biwergirtin. Li paş demeke kurt de Doq desthilatîyên weha gewre nema bi niyazmend datin bidîtin, jiber ku ew dihate bitirsandin, ku ew dikarin kîndariyê bidin bidurustkirin. Belê wî wêçaxê ji bona welêt Serpereştîyeke Bajarvanî ligel Serekekî bi nav û bang date bidanîn, ku ligel wê Serpereştîya Bajarvanî de ji bona her bajarekî rêberê wêyî peyvdar dihate bidîtin. Jiber ku wî date nasîn, ku zordariya berî niha li nik hinekan de kîndarî dayite bipeyda kirin, wî dixwest bide

¹Navê wîyî rast bi Remigius de Lorqua -Remigyus de Lorkua- ve tete biderkevîtin. Ew ligel Sêsarê de der sala 1498 de ji Firensa hat.

biderxistin, da ku ew xwe li nik Milet de ji her lêgûmankirînekê de bide bişuştin û ew careke din wî bi carekê ve ji xwe re bide bikarkirin, ku bigir hemû zordarîyên kirî ne ji bona wîna, lêbelê ew ji bona rûçikên bedkarîyên Wênerê wînayî Orko têtin bizîvirandin. Li nik kêseke zûkirî de wî ew li Gesena de di sibehekê de di nava bazara bajêr de date bihiştin, ku ew bête bidutakirin û wî ew ligel xencerekê de bi darekî ve li ser kenarekî rê de date biçiqandin¹. Vê mêrkujîya hanêyî hov dilê xelkê date bixweşkirin û wê kêreke kur di nava dilên wan de date bixistin.

Debara em xwe ji bona ser deqa destpêkirina xwe bidin bizîvirandin. Ez didim bidiyarkirin, ku Doq zor hate bixurtkirin û ew ji metirsîyên çavbeloqî tanî radeyekî hate biewlekirin, jiber ku ew niha bi xwedanê sipahên xweyî pir ve têtê bidîtin û wî ew leşkerên hanê, yên ku ew jiber nêzîkbûna xwe jêre dikarîbûn bihatina bitirskirin, tanî radeyekî baş dane binabûdkirin. Heger ku wî bida bixwestin, ku ew li ser vegirtinên xwe de bide biçûyîn, weha bes û bi tenha ve divabû ku hayê wî ji Padîşahê Firensî bihata bidîtin²; jiber ku wî date bizanîn, ku dê Padîşahê Firensî, yê ku ew di paş de bi şaşbûna xwe ve hate bişiyarkirin, wî di nav wan vegirtinan de bide bihiştin. Gava ku li ser van encaman de Firensiyan xwe ji bona nava Padîşahiya Neapel - Neapil- de datin birakişandin, da ku ew Sipanîyan bidin biderkirin, yên ku wan di wêçaxê de li Geata de dabûn bidorgirtin³, wî bi avêtina çavên xwe ji bona dîtina Hevalbendên nuh ve date bidestpêkirin û wî ligel Firensa de yarîyeke dualî dida bilîstin. Mebesta wîna weha dihate

¹Der 26. çileyê paşîna sala 1502 de Mikavilî bîvanê vê rûdana hanê bû û wî di wê rojê de di raportekî balyozxane de ji bona karmendîya xwe li ser de date biaxivtin.

²Sêsarê divabû ji bona Ludwig XII. -Ludvigê Duwanzdehemîn- li ser erkên xweyî kevnar de jê re hayê xwe bide bikirin.

³Jiber parvekirina Padîşahiya Neapel de Firansozan û Sipanîyan ceng ligel hevdu de didane bikirin. Firensozan di vê cenga hanê de du şikestinên giran (der cotana sala 1503 de) dane bixwarin. Alexander IV -Iskenderê Şeşem- ligel Sipanîyan de date danûsitandin, gava ku wan hêj Gaeta didan bidorlêgirtin, da ku ew ligel wan de Toscana -Toskana- û Lombardei -Lombarday- bide bivegirtin. Belam der 18. tîrmeha sala 1503 de Alexander VII. Iskenderê Şeşem- hate bimirin.

bidîtin, ku ew ewlebûna Firensîyan ji xwe re bide bigirtin. Evaya dê bi lez û bez ve jêre bihata bidestkevtin, heger ku Alexander -Iskender- di jînê de bihata bimayîn. Evanan bi pêrabûnên siyasîyî Doq ve derbarê rewşa niha de dihatin biderkevtin.

Lêbelê ji bona ayinde divabû ew ji tevan bêtir bête bitirsandin, ku Papekî nuh dê ew ji bona wîna ne bi dostê wî ve bête bidîtin û dê ew ji xwe re bide bikarkirin, ku ew ji wî careke din wanan bide bisitendin, yê Alexander -Iskender- pê dabûn dan. Ji bona vêna wîna date biremankirin, ku ew xwe jê bi çar şeweyan ve bide bivegirtin:

1. Di pêşî de wî date bixwestin, ku ew tevaya Merivên wan Mîrzayan bide binabûdkirin, yê ku wî ji wanan serdarîkirin dabû bitalankirin, da ku ew her palpêdanekê ji bona destdirêjîya hêrîşa Papa bide binehiştin;
2. Wî dixwest, ku ew tevaya Şahzadeyên Roma ji bona xwe bide bikarkirin, ya ku min berî niha ew dabû binîşandan, daku ew bi alîkarîya wan ve bikaribe Papa di nava sînore wî de bide bihiştin;
3. Wî dixwest, ku ew Civata Sermetranan li gora karîne de bi ser rexên xwe ve bide birakişandin;
4. Wî dixwest, ku ew hêjî berî mirina papa weha bi pirî ve ji xwe re desthilatîyê bide biwegirtin, da ku ew bahozê hêrîşa pêşîyê Dujminên xwe bi hêza ve bikaribe bide bişikendanin.

Ji van her çar karan ve wî sisê ji wan berî mirina Alexander -Iskender- datin bicîanîn; wî bigir ew hemû Mîrazan dane bikuştin, ji yê ku wî ji wanan Serdarîkirinên wan dabûn bitalankirin û ji yê ku ew dikarîbûn çavên xwe ji bona wan Serdarîkirinan bidin biavêtin; bes û bi tenha ve pir kêr ji wan dikarîbûn xwe bidin birizgarkirin. Wî Şahzadeyên Roma ji xwe re dane bikarkirin û ji Civata Sermetranan wî dikarîbû piranîya wanan ji bona ser rexên xwe ve bide birakişandin. Derbarê vegirtinên wî nuh ve wî ji xwe re dida bixwestin, ku ew bi Mîrzayê Toscana -Toskana- ve bête bikin; wî Perugia -Perugia- û Piombino -Piyombino- di nava destên xwe de didatin bidîtin û wî ji bona Pisa

serdarîkirina parastinê dida bikirin¹.

Teyê bigota, ku ew nema divabû hayê xwe ji Firensa bida bigirtin. -Bi rastî jî ve ew nema bi niyazmendê wê ve dihate bidîtin; jiber ku Firensîyan Padişahîya Neapel jî ji bona Sipanîyan dabûn biwindakirin, weha bi vî corê hanê ve Firensîyan û herwehaji Sipaniyan xwe bi neçarî ve didatin bidîtin, ku ew dostanîya wîna ji bona xwe bidin biwergirtin-. Wî Pisa ji xwe re date bivegirtin. Li paş vîna de Lucca -Luka- û Siena -Siyena- him ji rexê kindarîya Florentsiyan û himjî ji tirsê wan de bi lez û bez ve xwe jê re dane biberdestkirin û tu destik ji bona Florentsiyan nedihatin bidîtin, ku ew wan ji xwe re bidin birizgarîkirin. Heger ku ew di vî salê de mîna sala berê de, (ya ku tede Alexander -Iskender- hate bimirin), wer bihate biserkevtin, dê wîna hêzeke çekdarî û navnîşaneke weha ji xwe re bida biwergirtin, ku dê wîna bikarîba xwe li ser hêza xwe de bidaba biragirtin û dê ew nema bêtir ji bext û alîkarîya çekên yê din de bihata biniyazmendîkirin, lêbelê dê ew bes û bi tenha ve ji hêz û karîna xwe bihata biniyazmendîkirin. Belê Alexander -Iskender- li paş pênc salan de hate bimirin, gava ku Cesarê -Sêzarê- dest pêdate bikirin, ku ew şûrê xwe ji nava kalanê wî bide bikişandin². Wî jê re li dûxwe de bes û bi tenha ve serdarîkirin li Romagna de bi girwakirî ve date bihiştin, wî jê re tevaya serdarîkirinê din li dûxwe de bi ba vikirî ve di navbera du leşkerên³ bi hêzî Dujmin ve dane bihiştin û bi

¹Wîna Piombino -Piyombino- der 3. kewçîrîna sala 1051 de, Perugia -Perugya- der çileyê paşînî sala 1503 de date vegirtin. Pisa, ya ku ew di nava parastina serdarîkirina wî de xwe didate bidîtin, dê ew bi lez ve jê re bihata bidîtin. Wêgavê dê jê re nema giran bihata bidîtin, ku ew wê divabûna hayê xwe ji bona Padişahê Firensa nema bide bikirin, yê ku wî ser rakişandina wîna ji bona Toskana date binayînkirin.

²Der sala 1498 de Ludvigê Duwazdehemîn Cesare Borgia -Sêsarê Borgya- ji bona Doqê -Fermanrewayê- Valence -Valnsê- date binîşankirin, li paş ku vîna xeftanê Sermetraniyê ji xwe date bidanîn. Li paş salekê de (1499)ew ji bona Aldarê keniştê hate binavkirin; di vî sala hanê de ji wî dest bi vegirtinê xwe ve date bikirin.

³Evanan leşkerê Sipanî bûn, yê ku wan Daeta û kelehên dinî Padişahîya Neapel dabûn bidorlêgirtin, yê ku Firensîyan li paş şikenandinê xwe de xwe ji nava wan dabûn bikişandin. Hwerwehaji hêjbêtir perçeyek ji leşkerê Firensî li nêzikî Roma de dihate bidîtin.

servandejî ve wî ew li ber mirinê de li dûxwe de date bihiştin.

Di nava cerg û hinavên Doq de hêz û jêhatîbûneke weha gewre dihate bipeydakirin, ew biserdejî ve weha bi başî ve dihate biliberkevtin, ku ew Mirovan ji xwe re bida bikarkirin yanjî wanan ji xwe re bide biwindakirin. Herwehaji wî ji xwe re di demeke kurt de bingeheên wisa xurt dabûn bipeydakirin, ku dê ew bi ser hemû dujwarîyên beramberî xwe ve bihata bikevtin, herger ku wan herdu leşkeran ew ber bitirsê ve nedana xistin yanjî heger ku belê ew bi xwe ve nenexweş bihata bidîtin. Bingeheên xurtbûna mayîna desthilatîya wîna xwe ji vanan didin biderxistin: Romagniyani¹ ji mehekê bêtir ji bona wî dane çavdêrîkirin; di Roma de, tevî ku ew bes û bi tenha ve bi nîv jîndar ve dihate bidîtin, ew di ewlebûnê de dihate bidîtin; tevî ku jî Baglioni -Bagliyonî-, Ventelli û Orsini² jî xwe ji bona nava Roma hatin kevtin, ew bi dijî wî ve bi tu tiştî ve nehatin birabûn. Heger ku wî jî nikarîbû li gora kêfa xwe de Kesekî li ser Kursiya Papayî de bide bicîkirin, belê weha wî dikarîbû wan jê bide bidûrîkirin, yê ku wî ew ne didan bidivatin. Hegerjî ku ew li nik mirina Iskender de nenexweş bihata bidîtin, weha dê jê re her tişt bi hêsanî ve bihata biderkevtin. Wî bi xwe ve ji min re di wan rojan de date bigotin, gava ku Julius -Yulyus- II. hate bihelbijartin³, ku wî ji bona wan hemû dibûnan li nik

¹Evan ji bajarên Imola, Forlî û Cesena -Kesena- dihatin bidîtin, yê ku wan serdarîkirina keniştên ji xwe re nedixwetin bidin bizanîn û wan ji bona xwe sipahên Sêsarê didan bidilbijandin.

²Evan Maqûlên Payan bûn û herwehaji pêrejî ew Mîrzayên deveran nbûn, yê ku ew ji bona Doq -Feramanrewa- ve bi Dujmin ve dihatin bidîtin, tevîjî ku kêş ji bona wan ji bona tolgirtinê bi başî ve jî dihate biderkevtin, wan tu livandin ji xwe re nedan bikin.

³Yulyus Duwem bi alîkarîya dengên Sermetranên hevalbendên Borgiya ve ji bona papayê hate bihelbijartin, jiber ku wî beramberî Borgiya girawkirinên dostanîyê jê re dabûn bidan, yê ku wî ew li paş de bi serî ve nedane bibirin. Mikavilî bi karê Karmendîya xwe ve di navbera çiriyê pêşîn û çileyê pêşîna sala 1503 de xwe li Roma de dida bidîtin, da ku ew li rûdanên civîna Sermetranan ji bona helbijartina Papa bide

mirina bavê xwe de ji xwe re dabû biremankirin û wî ji bona heryekê ji wan jî çarekirinek dabû bidîtin; belam wîna tucarî li ser wê dibûnê de nedabû biremankirin, ku ew dê ligel mirina wî de bi xwe ve xwe nexweş li ber mirinê de bide bidîtin.

Gava ku ez niha li hemû pêrabûnên Doq de bi givaştî ve didim bitemaşekirin, wer ez nikarim tu binavdûxistinan jêre bidim bikirin; bi servajî vê jî ve ew ji min re bi rastî ve têtiin biderkevtin, ku ez wî, mîna ku min ev li jor de dayite bikirin, ji bona wan hemûyan bi hawakirina wîna ve didim biamojgarîkirin, ji yên ku ew di rêya bext û di rêya alîkarîya çekên Bêgane de ji bona ser Textê serdarîkirinê hatine bihilkişandin. jiber ku wî ji xwe re serdarîkirin didate bixwestin û bi bernameyên mezinê têrkirî ve dihate bidîtin, wî bi carekê ve tiştêkî din nikarîbû bida bireftarkirin; bes û bi tenha ve kurtbûna mana Jîyana Iskender û nexweşîya wî ber li ber bicîanîna bernameyên wî de dane bigirtin. Kî ji xwe re bi niyazmendî ve dide bidîtin, ku ew di serdarîkirineke vegirtîyî nuh de xwe ji Dujminên xwe bide biparastin, Dostan ji xwe re bide bipeydakirin, xwe di rêya zordarîyê de yanjî di rêya konebûnê de bide biservexistin, xwe bide bihezkin û pêrejî jê bête bitirsandin, sipehan di nava zindanê de bide bihiştin û pêrejî ew ji bal wan ve bête bihêjakirin, hêjbêtir kî ji xwe re bi niyazmendî ve bide bidîtin, ku ew wan Kesan bide binabûdkirin, yên ku ew dikarin wî bi ziyarî ve bidin bikirin yanjî bi neçarî ve dê lê bidin bizîyankirin, ku ew bi mêrxas û çavfireh ve bête biderkevtin, kî ji xwe re bi niyazmendî ve bide bidîtin, ku ew Sipahên nedilsoz ji hevdû bide bixistin û ew ji xwe re hêzekeçekdarîyî nuh bide bisazkin, hêjbêtir ku ew ji xwe re dostaniyê ligel Padîşahan û Serdaran dixwaze bide biragirtin, da ku ew bi dilxweşî ve di hewara wî de bêtin yanjî ku ew xwe bidin biparastin, ku ew ji bona wîna nedin bihêrîşkin, ew nedikare ji van nimûyên hanêyî gotî de ji xwe re baştir ji karên vî Mirovê hanê bêtir bide bidîtin.

Mirov dikare ji bona wîna bes û bi tenha ve di helwesta wî de derbarê binavkirina Papa Yulyus de navbidûde bide bixistin; li hêre de

bitemaşekirin. Di vê kêsa hanê de wî serdana Cesare -Sêsarê- di zindanê de date bikirin.

wî helbijartineke bed date bikirin¹. Jiber ku wî, mîna ku min berê li jor de dayite bigotin, nikarîbû li ser Kursiya Papayî de li gora dilê xwe de Mirovekî bide bicikirin, lêbelê weha jê re dihate bidîtin, ku wî dikarîbû bida bikirin, ku yekek bi Papa ve neyête bikirin. Divabû ku ew bi tu awayekî ve helbijartina Sermetranekî ji bona Papa nede bihiştin, yê ku wî ew carekê dabû bipîskirin û yê ku ew li paş hilkişandina xwe de ji bona papa dikarîbû wî bide bitirsandin. Jiber ku Mirov bi hevdû re dujminayetîyê jiber tirsê yanjî jiber kînê didin bikirin. Ew Sermetranên hanê, yên ku wî ew dabûn bibêzarkirin, di nava wanan de jî San Pietro -Pêtros- ad, Vincula -Vinkula- herwehaji Colonna -Kolonnayê ji San Corcya û Ascanio -Askanyo-² dihatin bidîtin. Hemûyên dinî mayî ew carekê bi Papa hatibûn bikirin û ji bona wanan palpêdan ji bil Sermetranê ji Rouen³ û Sermetranê Sipanê⁴ pê ve dihate bidîtin, ku ew jê bêtin bitirsandin. Ev herdu jî jiber merivatîya wan û mercên dinî taybetî jê nedihatn bitirsandin. Sermetranê Rouen ew jiber xurtbûna xwe ve û jiber ku Padîşahê Firensa piştî wî dida bigirtin û Sermetranê Sipanî jiber ku ew bi mirovê wî ve dihate bidîtin. Jibervêjî divabû Doq di pêşîya pêşîde Sipanîyek ji bona Papa bide bikirin û heger ku wîna ev nikarîbû ji xwe re bida bikirin, weha divabû ku ew dengê xwe bes û bi tenha ve ji

¹Evaya di vir de dihate bidîtin, ku wî xapandina xwe date bihiştin, gava ku wî helbijartina Sermetran Giuliano -Giyuliyano- della Rovere date bihiştin, yê ku wî ew dabû biarzarkirin.

²Sermetran ji San Pietro ad Vincula ew Giuliano -Giyolyano- della Rovere bû, Ji Malbata Colonna -Kolonna- Sermetran Giovanni -Giyovanni- dihate biderkevtin, Sermetranê ji San Giorgio -Corc- ew Raffaello Riario -Riyaryo- di Savona bû, Sermetran Ascanio -Askanyo- ji Binemala Sforza dihate biderkevtin, yê ku ew Kurê Galeazzo bû û Doqê -Fermanrewayê- Mayland bû.

³Evaya li ser Metran Georges d' Ambios -Corc de Ambiyosê- Roma de tête bidîtin, yê ku ew ji bal Papyê Iskenderê Şeşem ji bona Sermeranîyê hatîye bihilkişandin.

⁴Di nava civata Sermetranan de yanzdeh Sermetranên Sipanî dihatn biderkevtin, ku hiç yekekî ji wanan di xwe de neda bidîtin, ku ew bi Papa ve bête biderkevtin.

bona helbijartina Sermetranê Rouen bide bidan û ne ku ew dengê xwe ji bona Sermetranê San Pêtro ad yanjî ji bona Sermetranê Vincula - Vinkula bide bidan.

Kî ji xwe re bide bawerkin, ku Mîrzayên mezin jiber qencîyeke nuh ve dê ew bêzarkirinên xweyî kevin bidin bijibîrakin, ew xwe bi xwe ve didin bixapandin. Wisa Doq der vê helbijartina hanê de şaşbûnek ji xwe re date bikin; ev şaşbûna hanê jî di dawîya dawî de bi hoyê windakirina wî ve hate bikin.

Derîyê Heştem

Li ser wergirtina Serdarîyekê de di rêya mêrkujyê de

Belê hêjî du dibûnên din jî têtin bidîtin, bê ka çawan Mirovekî sade ji bona desthilatîyê dikare bête bihilkişandin; herdu jî Mirov nikare wanan jiber xwe ve bi bext yanjî bi jêhatîbûnê ve bide bigirêdan. Lêbelê ez dixwazim wanan ne jibîrakî bidim bihiştin, tevî ku jî Mirov li ser yekêkê ji van dibûnan de bi dirêjî ve derbarê peyivandina li ser Komaran de dikare bide biaxivtin. Ev herdu dibûnên hanê wisa têtin biderkevtin.: Mirov di rêya mêrkujyê de û bi destikên bêbextîyê ve ji bona serdarîyekê tete bihilkişandin, yanjî Mirovekî sade di rêya qenciya Hevneşîniyên xwe de bi Mîrzayê welatê Bavûkalan ve tete bikin. Derbarê dibûna pêşîn de ez du nimûneyan yekekê ji dema kevnar û ya din ji dema meyî nuh didim bidan, bêyî ku ez xwe ji bona wêna bidim biterefdarîkirin; jiber ku li gora bawerîya min de bi têrî ve jê re tete bidîtin, gava ku Mirov wê bi neçarî ve dide bihawayîkirin.

Agathokles Sizilianer -Agatoklêse¹ Sisilyanî- ew ne jî carekê ji kokeke Burcuwazî bû, lêbelê ew bi carekê ve ji kokeke nizimî pîs ji bona Padîşahê Syrakus -Syrakus- hate bihilkişandin. Ew kurê Cervanekî bû; ji xortaniya xwe ve wî tucarî di jîna xwe de devji mêrkujîya xwe nedida biberdan: lêbelêjî wîna bedkarîyên xwe bi

¹Ew der sala 317 b. z. de bi Padîşah hatiye bikin û ew der sala 289 B. Z. de hatîye bimirin.

liberkevtinek û tîneke weha pir ve didanbi kirin, ku gava ew bi Serbaz ve hate kirin, ew bi hemû nîşânên serbazî ve hate binîşankirin û ew di payîna payîn de bi Prâtor -Serdarê- Sirakus ve hate bikirin. Gava ku ew bi vê şûna hanê ve hate bigihaştin, wî ji xwe re date bibiryarîkirin, ku ew bi Şahzade ve bête bikirin û ew bi darêço ve û bi bêguhndan ve ji bona tu Kesî ve xwe bide biragirtin, ya ku ew jê re bi azadî ve jiber xwe ve jiberê de dihate bidîtin. Wî ev mebesta xwe ji bona Hamilkarê Kartagî¹ date bigotin, yê ku wî bi sipahên xwe ve di Sisilyan de ceng dida bikirin. Sibehekî ji sibehan wî Xelk û Pîremerdên Sisilyan bi mehna ji bona kombûna şewirdarîyekê li ser kar û barên Komarê de dane bibangkirin û wî li ser nîşaneke danîn de hemû Pîremerd û Dewlemendên bajêr ji bal serbazên xwe ve hiştin, ku ew bêtin bigurandin. Piştî vê mêrkujîya hanê wî ji bona xwe serdarîkirina bajêr date bizeftkirin û wî ew ji xwe re bi bêyî hîç piştînekê ji bal Xelkên bajêr ve di nava lepên xwe de date biragirtin. Tevî ku ew ji bal Kartagyan de ducarî jî hatibû bişikenandin û dor lê hatibû bigirtin, wî dikarîbû ne bes tenê ku ew li ber bajarê xwe de bida bidan, lêbelê jî wî hinek ji sipahên xwe ji bona liberxwedana dorlêgirtina bajêr dane bihiştin û wî bi perçê din ve wî hîrîşî Afrîka date bikirin. Di demeke kurt de wî dorlêgirtina Sirakus date bivekirin û wî Kartagî di koşeke pir teng de datin bigivaştin; ew bi darêço ve hatin bineçarkirin, ku ew bi peyaman ve ligel wî de xwe bi Maldarîyên xwe ve li Afrika de bidin bitêrkirin û ew Sisilya ji bona Agathokles -Agatoklê- bidin bihiştin².

Kî li pêrabûnên û jîyana Agatoklê de ji xwe re bi nêzîkî ve bide bimeyze kirin, dê ew ji xwe re bide binaskirin, ku di nava wan de kê m yanjî bi carekê ve tu tişt bi bext ve nehatîye bisipartin; jiber ku ew, mîna ku li jor de hatîye bigotin, ne di rêya qencîya yekekî din de berbijor ve hatîye bihilkişandin, lêbelê ew di rêya derbasbûna di nava pileyên sipahî de, yên ku ew bi wan ve li jêr hezar dujwarîyan û metirsiyan de hatîye bigihaştin, ji bona serdarîkirinê hate bihilkişandin

¹Bavpîrê Hamilkar Barkas û Bavê Hannibal.

²Evaya bi ratî ve nayête biderkevtin; jiber ku bes û bi تنها ve perçê Yunanî ji Sisilyan ji bal Syrakus -Sirakus- de hatîye biserdarîkirin û perçê din jê ew di jêr serdarîya bajarê Kartago de dihate bidîtin.

û wî ew bi pir konebûn û biryarîyên metirsîyên mezin ve dikarîbû bida bizeftkirin. Belê Mirov nikare vîna bi jêhatîbûnê ve bide binavkirin, gava ku Mirov Neşînvânê ligel xwe de bide bigurandin û li Hevalên xwe de bide bibêbextîkirin û gava ku Mirov bi bêdilsozî, avrû û oldarî ve bête bidîtin; belê bi vî rengê hanê ve Mirov bi rastî ve dikare desthilatîyê bi destên xwe ve bide bixistin, belam kê mî nav û bangîyê ve Mirov dikare bête bigihaştin. Lêbelê gava ku Mirov ji xwe re li tîna Agatoklê der rûbirûkirina tîrsan de û der zorbirina wan de dide bitemaşekirin, herwehaji gava ku Mirov ji xwe li rewanîya wîyî mezin de dide bitemaşekirin, ya ku wî pê bedbextî ji xwe re dida bihilgirtin û ya ku wî ji xwe re pê zora wê dida bibirin. Wetov Mirova nikare bi regekî din ve bide bidîtin, çima divê ew bi nebaşî ve ji mîna Serleşkerkî din ve bête bidadkirin. Tevlivêjî de zordarî û bêmirovaniya wîyî bênimûne û herwehaji tawankariyên wîyî bêjimar nahêlin bête bihiştin, ku Mirov wî di nava rêzên Mrovên Gewre de bide bijimartin. Weha divê ku Mirov ne ji bona bext û nejî ji bona qencîyê jî bide bipêvekirin, ya ku Mirov bêyî wan herduwan jî bi mebesta xwe ve hatîye bigihaştin.

Di vê dema me de û nemaze di pêla serdarîya Iskenderê Şeşem de li ser nimûneya Oliverotto¹ de ez dixwazim bidim biaxivtin. Ew di zarotiya xwe de, jiber ew bê bav mabû, ji bal Lalê xweyî Giyovanni Fogliani de hate bixwedîkirin û wî ew di xortaniya wî de ji bona nava sipahê Paolo Vitelli date binardin, da ku ew bi başî ve bête biperwerde û bifêrkirin û da ku ew li paş de ji bona Payedarîyên sipahê bête bihilkişandin. Li paş mirina Paolo² de wî li jêr destê birayê wîyî Vitellozzo³ de date bikarkirin, li paş demeke kurt de ew bi saya kosetîya xwe û rûçikên başî gewde û rewanîya xwe ve bi Merovê pêşî di nava leşkerê wî de hate bikirin. Jiber ku ji bona wîna bi nokerî ve dihate bidîtin, ku ew li jêr destdarîya yekekî din de bête bidîtin, wî ji

¹Oliverotto ji bal Sêsarê de di bajarê Sinigaglia de hate bikuştin, ev kuştina hanê li paş saleke de ji danîna wîna ji bal Sêsarê de bi Mîrzayê Fermo ve hate birûdan.

²Ew ji bal Filorentinîyan de, yê ku wî sipahên wan di cengê de dijî Pisa dida biserdarîkirin, bi bêxtîyê ve lê hate gûmankirin û ew der sala 1499 de hate bidarvekirin.

³Vitellozzo li bajarê Sinigaglia de ji bal Sêsarê de hate bikuştin.

xwe re date bimebestkirin, ku ew bi alîkarîya hinekan ji Neşînvânên Fermo ve, yê n ku wan noke rî di ser azadîya walatê Bav û kalan de dida bigirtin, herwehaji bi destûra Vitelli ve ji Fermo ji xwe re bide bigirtin. Wî ji bona Giyovanni Fogliyani date binivîsandin, ku ew dixwaze ji bona wî û bajarê wîserdanîyekê bide bikirin û herwehaji ew di xwaze çavpêdanekê ji bona ser milk û malên Bavê xwe ve bide biavêtin; jibervêji wî bes û bi tenha ve ev xwestina hanê dayite bikirin, ji bona ku ew pê bête biserbilindkirin, da ku Neşînvânên ligel wê de bidin bidîtin, ku wî dema xwe bi başî ve dayite bikaranîn. Jibervêji ew dixwaze bi serfirazî ve ligel 100 Siwarên ji Heval û Nokrên ji bona wêderê de bête birêkevtin. Herwehaji wî date bihêvîkirin, ku ew wî bi rêxistineke pêşewazîyî serbilindî ve di rêya Nişînvânên Fermo de bide bidilşadkirin; evaya ne bes tenê dê wî bide biavrûkirin, libelêji dê ew Giyovanni nala Perwedekirvanê wî bide birûmetkirin.

Giyovanni li ser bicîanîna hêvîyên Xwarzê xwe de tu kêmanî nihişt bêtin bikirin. Oliverotto ji bal Xelkên bajarê Fermo bi hemû rûmetê ve lê hate bipêşewazîkirin û ew di kaxa Giyovanni de hate bimêvankirin. Wî li wêderê de çend roj dane birabuhurandin û wî bi dizî ve hemû kar û bar datin bilidarxistin, ji yê n ku ew ji bona mebesta tawakarîya wîna bi niyazmendî ve dihatin bidîtin. Wî mêvandarîyeke taybetîyî bi şahî ve date bilidarxistin û wî ji bona nanê vê mêvandarîya hanê Giyovanni Fogliyanî û Gewreyên bajarê Fermo dane bimêvandarîkirin. Li paş nanxwarina ser sifrê de û pev û gotinên li ser nala mêvandarîyên wisa de Oliverotto peyvdarî bi jîrbûn ve ji bona ser hin pirsên giring date biwergerandin, gava ku wî li ser mezibûna Papa Iskender û Kurê wîyî Sêsarê de û her wehaji li ser pêrabûnên kar û barên wan de date biaxivtin. Gava ku Giyovanni û yê n din ji li ser wê peyvdarîyî dane biaxivtin, wêgavê ew ji nişkê ve ji cihê xwe rabû û wî date bigotin: li ser van peyvên hanê de divê Mirov bes û bi tenhave li cihekî nehîndê de bide biaxivtin û wî xwe ji bona nava odak din date bikişandin, wehaji Giyovanni û hemû Xelken din ji bi peywî ve hatin bikevtin. Hêji wan xwe bi başî ve nedabûn birûniştin, gava ku ji piş veşartiyekê Serbaz hatin biderkevtin û wan Giyovanni û hemû yê n din dane bivegurandin.

Li paş vê kuştina hanê de Oliverotto li hespê xwe de hate bisuwarbûn, wî zengoya xwe lê date bixistin û wî berê xwe ji bona

dorlêgirtina mala Şhrevanîyî bilindtirîn karmendîyê¹ date bivekirin, jiber bizdanê wî Karmendê bilind xwe bi destên wî ve date biberdan, ku ew jê re guhdarîyê bide bikirin û serdarîyekê jê re bide bisazkirin, ya ku Oliverotto bi xwe ve xwe bi sardarê wê ve date bikirin. Piştî ku hemûyên, yên ku ew jiber kîna xwe jê re dikarîbûn lêbidin biziyan kirin, hatin bikuştin, wî serdarîkirina xwe di rêya bi rêxistina nuhî serpereştîyê û sipah ve date bixurtkirin. Weha di nava derbasbûna salekê de, di wê dema ku desthilatî di nava destên wî de dihate bidîtin, jê re nebes tenê bajarê Fermo zeftkirî di nava lepên wî de dihate bidîtin, herwehaji hemû Dirawsên wî jî jê dihatin bizdandin. Derkirina wîna dê werjî ew bi dijarî ve nala derkirina Agathokles -Agatoklêsbihata bidîtin, heger ku wî xwe ji bal Cesare Borgia -Sesarê Borgiyyade nehiştta bête bixapandin, gava ku Sesarê li Sinigagliya de, mîna ku min li jor de li ser dayite biaxivtin, Orsini û Vitelli dane biberdestkirin. Li wêderê de ew jî hatebi girtin û li paş salekê de ji kuştina Mamê wî ligel Vitellozzo de, yê ku wî ew ji bona hemû jêhatîbûnên wîna û herwehaji ji bona hemû mêrkujûyên wîna jî dabû bifêrkirin û biperwerdekirin, hate bixeniqandin.

Niha Mirov dikare ji xwe bide bipirskirin, ji kûde tete biderkevtin, ku Agatoklêsbihata bidîtin û hin celebên dinî mîna wîna li paş bêbextîyên bêjimar û hovbûnan de demeke dirêjî bêtirs di nava bajarê Bav û Kalan de dikarin bêtin bijîyandin û ew li ber xwe beramberî bi Dujminên derve ve bikaribin bidin bidan û ku Neşînvânên wan serên xwe li ber wan de tucarî ji xwe re nedane bihildan, di dema ku belê gelekî din tevî hemû bikaranîna destikên hovîtîyê de wan nedikarîbûn xwe di dema aşîtîyê de û ne jî di demên tevlihevî cengê de bidana biragirtin. Evaya li gora bîr û bawerîya min de ev bi vê ve tete bigirêdan, magelo Mirov ji hovîtîyan bikaranîneke bed yanjî baş dide biderxistin. Bi karanîna başî ve ji bona destikên hovîtîyê Mirov dikare bes û bi tenha ve bide binavkirin, heger ku evaya jî Mirov bikaribe carekê ji caran jî ji bedbûnê re bi başî ve bide bigotin, gava ku Mirov wê ji bona yek carê dide bikaranîn, da ku Mirov xwe bide biparastin,

¹Fermo bi xwedanê destûreke komarî ve dihate bidîtin.

lêbelê li paş de divê Mirov wê nema bide bikirin û hêjbêtir divê ku Mirov wêna ji bona dibûna mezintirîn berjewendîyên Jêrdarên xwe bide bikaranîn. Bikaranîna bedbûnê bi destikên hov ve têtin biderkevtin, dibe, ku ew di pêşî de jî di jimara xwe de bi kêm ve bêtin biderkevtin, belam ew bi derbasbûna demê ve bêitir têtin bipirkin, ji dêlva ku ew bêtin binemankirin. Yên ku wan ji xwe re rêya pêşî dane bikaranîn, wan bi alîkarîya Yezdan û Morovan ve dikarîbûn ji xwe re hin ji destekên ewlebûnê ji bona hîmkirina serdarîkirina xwe bidin bikarkirin, mîna ku evaya li nik Agatoklêş de hate bidîtin, lêbelê ji bona yê din wî bi carekê ve nikarîbû bida bikirin, ku ew serdarîkirinê xwe ji xwe re bikaribin bidin biragirtin.

Jîbervêjî divê ku Mirov ji xwe re bide bibîrxistin: Vigirtvanê, yê ku ew ji bona serdarîkirinekê destên xwe dide biavêtin, divê ku ew li ser hemû zordarîyên xwe de, yê ku ew bi neçarî ve divê wan bide bikirin, bi têrî ve bide remankirin û wan bi yeklêdanê ve bide bicîanîn, da ku ew ne her roj ji nuh ve careke din bi wan ve divê bide bidestpêkirin; bes û bi tenha ve gava ku ew wan ne hercar ji nuh ve bide bikirin, ew dikare Mirovan bide biaramkirin û ew di rêya karên qencîyan de wan ji xwe re bide bikarkirin. Kî ji kêmbûna biyarîkirinê de yanjî ji dilbijandina bedbûnê de tişteki din divê bide bikirin, dê ew hergav bête bineçarkirin, ku ew di nava destên xwe de xincerê bide bihildan: ew dê nikaribe tucarî piştî xwe bi Jêrdarên xwe ve bide bisipartin, jiber ku ew xwe jiber karên zordarîyên wî nayî hergav nikarin ewlebûna xwe bidin bihestkirin. Karên zordarîkirinê divên weha hemû di yekcarê de bêtin bikaranîn, da ku ew bi kêmî ve bêtin bihestkirin û jîbervêjî ve bi kêmî ve ew bidin bibirîndarkirin. Karên qenc bi servajîvêjî ve divê Mirov wan bes û bi tenha ve wirde wirde bide bikirin, da ku ew bi başî ve bêtin bidîtin. Jîbervêjî divê her Serdarek wisa xwe beramberî Jêrdarên xwe bide bireftarkirin, ku hîç rûdanek lê nede bizordarîkirin, ya ku ew dibe çî bi başî ve yanjî çî bi bed ve bête bidîtin, ku ew hinekî reftara xwe bide biveguhertin; jiber ku di rêya demên dujwar de kêşên neçarî têtin bidîtin; weha divê Mirov destên xwe ne bi lez ve ji bona karên zordarîyê bide avêtin. Herwehaji qencî, ya ku tu wê dide bikirin, ew bi kêrî te nayete bikirin, jiber ku sitendina wêna ji te bi zorê ve tete biderkevtin û ji bona wê qencîyê kesek ji te re nade bisipaskirin.

Derîyê Nehem

Li ser serdarîkirina Neşînvaneke de

Niha ez ji bona ser reneke¹ din ji serdarîkirinê didim biaxivtin: Bi xwe ve gava ku Mirovek ji Milet ne di rêya mêrkujyê de û ne jî di rêya zordarîya hovîtî de, lêbele di rêya pêxweşîya hevweletîyên xwe de bi Zaldarê welatê xwe ve bête bîkirin. Merov dikare vê bi serdarîyeke Gel² ve bide binavkirin. Da ku Mirov ji bona vêna bête bigihaştin, Merov ne divayê jêhatîbûneke taybetî yanî bextekî taybetî, lêbe Mirov bêtir divayê bextekî tete bîkirin, yê ku ew ji bal konîtyê de tete bikêskirin. Li gora bîr û bawerîya min de Mirov ji bona ser vê serdarîkirina hanê di rêya pêxweşîya Gel de yanî di rêya pêxweşîya Mîrzayên Gewre de tete bihilkişandin. Di her bajarekî de ev herdu berên hevdiş xwe didin bidîtin. Ev jî ji bona vê tetê bivegerandin, ku Gel xwe ji bal Mîrzayên Gewre de naxwaze bête bizalkirin û ne jî ew dixwaze ji bal wan de bi bindest ve bête bihiştin, ji rexê din de Mîrzayên Gewre biservajîvêjî dixwazin li ser Gel bêtin bizalkirin û wî bi bindest ve bidin bixistin. Ji van herdu xwestîyên hevdiş di nava bajarekî de sê kêrên cudan têtin bihestandin: Serdarîkirina bi serê xwe ve, Azadî û yanî Serberdayetî tete bidîtin.

¹Ji xwe re li destpêka derîyê heştam bide bitemaşekirin.

²Mikavili di bin de ne bi serdarîkirineke bi serê xwe ve, lêbelê bi reneke komarî ve tete biliberkevîtin. herwehaji Desthilatvan ne Begane ye, lêbele ew Neşînvane bajêr bi xwe ye.

Serdarîkirina bi serê xwe ve ji bal Gel de yanjî ji bal Mîrazayên Gewre de tête bicîanîn, ev jî tête kirin, gava ku yekek ji wan partîyan ji xwe re kêsan ji bona danî wêna didin bidîtin. Belê gava ku Mîrazayên Gewre bidin bidîtin, ku ew beramberî Gel tu liberxwedanê nekarin bidin bikirin, wêçaxê ew dest bi neqandina yekekî taybetîyî ji xwe didin bikirin û ew wî ji bona Serdarê bi serê xwe ve didin bikirin, da ku ew di bin parastina wîna de mebestên xwe bi carekê ve bikaribin bidin bicîkirin.

Herwehaji gava ku Gel bide bidîtin, ku ew xwe ligel Mîrazayên Gewre de nikarin bidin biberamberkirin, wêçaxê Gel yekekî ji nava Neşînvânên xwe bi tayebeî ve didin biberzîkirin û ew wî ji bona Serdarê bi serê xwe ve didin bikirin, da ku ew di rêya desthilatîya wî de parastina xwe bidin bidîtin. Kî bi yarmetîya Mîrazayên Gewre ve ji bona serdarîkirina bi serê xwe ve bête bigihaştin, ew bi bêtirbûn ve ji xwe re dujwarîyan dide bidîtin, da ku ew xwe bide biragirtin, ji yê ku bi alîkarîya Gel ve bi Serdarê bi tenha xwe ve bête bikirin, jiber ku di dorhêla Serdarekî wetov de pir xwe didin bidîtin, ji yên ku ew di xwe de mîna wî xurtîyê didin bidîtin; di encamê vê de ew nikare li ser wan de bide bifermankirin û nejî bi rastî jî ve ew dikare ligel wan de bide bireftarkirin.

Lêbelê kî di rêya pêxweşîya Gel de ji bona serdarîkirinê bête bigihandin, ew bi tenha xwe ve li rastê de tête bidîtin, jê re tu Kes yanjî kê Kes li dorhêla wî de xwe didin bidîtin, ku ew xwe ji fermanên wîna didin bidûrkirin. Hêjîbiserdejî ve Merov nikare Mîrazayên Gewre tucarîjî bide bidilxweşkirin, gava ku Merov bixwaze dadwerî bête bicîkirin û ji bona tu Kesên din bicîanîna bêdadwerîyê nede bixwestin; lêbelê Mirov dikare Gel bide bidilxweşkirin. Jibervêjî xwestina Gel ji bona dadwerîyê ji xwestina Mîrazayên Gewre mezintir tête biderkevtin, jiber ku Mîrazayên Gewre dixwazin Gel bidin bindestkirin, Gel biservajîvêjî ve bes û bi tenha ve dixwaze ku ew neyête bindestkirin. Hêjîbêtir her Serdarek, yê ku ew xwe bi dujminê Gel ve dide bidîtin, nikare ji xwe re carekê ewlebûnê bide bihestkirin; jiber ku ew ligel gelek Mirovan de dide bidanûsitendin. Nebaştirîn tişt tête biderkevtin, gava ku Serdarekî ji bal Gel kînlêrî de ji xwe re dide bibawerkirin, ku Gel di dema tengavîyê de devjê dayite biberdan. Kî biservajîvêjî ji xwe re Mîrazayên Gewre bi dujmin ve bide bidîtin, ew

divê ne bes tenê bête bitirsandin, ku ew dê ji bal wan de di dema tengavîyê de devjê bête biberdan, hêjî biserdejî ve divê ew bête bitirsandin, ku ew dê serên xwe dijê wî jî bidin birakirin; jiber ku ew bi jîrtir û konetir ve têtin bidîtin, ew hergav hêjî di dema pêwist de xwe ji bona ewlebûnê didin bigihandin û xwe ji bona rexê hevalbendîya wî Kesî ve didin bialîkirin, yê ku biserkevtina wîna têtê çbiavdêrîkirin. Herwehaji ji bona Serdarekî bi neçarî ve têtê bidîtin, ku ew hergav ligel wî Gelî bi xwe de têtê jîyandin, biservajîvêjî ve ew dikare bi başî ve bi bêyî wan Mîrzayên Gewre bi xwe ve bête biderkevtin, jiber ku ew her roj dikare hin kesên din ji bona wê Gewrebûnê bide binîşankirin û ew careke din dikare wan ji wê nîşanê bide bixistin û ew bi carekê ve dikare li gora kêfa xwe de wan bide bidakirin yanjî wan bide bilindkirin.

Da ku ez vêjî hêjîbêtir bi têgihîştîtir ve bidim biliberxistin, ez dixwazim bêjim, ku Mîrov di reftara xwe de ligel Mîrzayên Gewre de du rûwên alîyên bingehî cudan divê ji xwe re bide bibîrxistin: yan dê ew xwe weha der derbasbûn rûdanan de bidin birabûnûrûniştin, ku ew dê hemûyî ji bona ser bextê te bidin bidanîn, yanjî ew vêna nadin bikirin. Yê ku ew ji bona Serdar bi dost ve têtin bidîtin, divê Mîrov ligel wan de, heger ku ew ne bi talanker ve bêtin bidîtin, bi rûmet û dostanî ve bide bireftarkirin; ligel yê din, yê ku ew ne bi dost ve têtin bidîtin, divê Mîrov du dibûnan bi bîr ve bide bixistin: yan ew vê ne ji tirsan û ne jî ji kêmbûna mêrxasîyeke zikmakî de didin bikirin, wer divê ku tu van ji xwe re bide bikaranîn, bi taybetî ve gava ku ew te bi başî ve bikaribin bidin biamojdarîkirin; jiber ku tu xwe di demên baş de bi wan ve dide birûmetkirin û di demên bed de tu pêwistî bi tirsê ji wan ve nayête bidîtin. Lêbelê gava ku ew xwe ji te bi zanebûn û ji mebestên dilbijandî ve didin bidûrkirin, weha evaya wê nîşanê dide biderxistin, ku ew bêtir ji bona xwe ji te didin biremankirin; ji vanên wisa divê her Serdarek xwe bide bivegirtin û divê ew ji wan mîna Dujminên rastteqîne bête bitirsandin; jiber ku ew di demên tevlihev de hergav ji bona xistina wîna didin biyarmetîkirin.

Kî weha di rêya pêweşîya Gel de ji bona desthilatîyê bête bihilkişandin, divê ew xwe ji bona wêna bide bikarkirin, ku ew xwe di nava dilê Gel de bide bihiştin; evaya dê jê re bi hêsanî ve bête bikirin, jiber ku Gel bes û bi tenha ve dida bidaxwazkirin, ku ew neyête

bindestkirin. Lêbele kî dijî Gel bes û bi tenha ve di rêya pêxweşîya Mîrzayên Gewre de ji bona desthilatîyê hatîye bihilkişandin, divê ku ew di pêşîya pêşî de karkirina Gel ji xwe re bide bikarkirin. Ev dê jê re bi hêsanî ve bête bidestkevtin, gava ku ew bes û bi tenha ve parastina wîna ji bona ser milên xwe bide bihildan. Belê Gava ku Mirov qencîyekê ji Mirovekî bidin bidîtin, yên ku wan jê bedbûn didan biçavdêrîkirin, weha ew li ser xwe de beramberî bi Qencvanê xwe ve bi xurttir ve didin bierkkirin û dê Gel xweser jê re mêldarîyê bide bikirin, ev jî dê bêtir jê re bête bidîtin, ji mîna ku heger ew di rêya pêxweşîya Gel de ji bona desthilatîyê bihata bigihaştin. Serdarek dikare Gel ji xwe re di nava pir şeweyên cudan de bide bikarkirin. Li ser encamên veguhertinên hergavîyî zînetan de Merov nikare rêzanên nîşankirî ji bona wê bide bidanîn. Ez dê jibervêjî devjê bidim biberdan.

Niha ez ji bona dawîyê têtîm bigihaştin, ku her Serdarek divê li bal Gelê xwe de bête bihezkin; hegerna dê ew di demên tevlihev de bêpişt bête bidîtin. Nabis¹, yê ku ew Xwedanê desthilatîya Sparta bû, dikarîbû xwe li ber hêrîşa tevaya Yunanê û leşkerekî biserkevtîyî Romanî ve bide bigirtin û wî beramberî herduwa li ber welatê Bav û Kalên xwe û serdarîkirina xwe de dida bidan. Gava bayê tirsê bi ser ve hate bikevtin, bes û bi tenha ve ew pêwistî girtina hinek Mirovên kêma hate bikirin, yên ku dê ew ne bi têr ve bihatana bidîtin, heger ku Gel ji bona wî bi mêldarîya dujminatîyê ve bihata bidîtin. Merov vê bîr û bawerîya hanê nikare bermberî vê penda dêrandî bide bikirin, ku ew li se xîzê de dide biavakirin, yê ku ew bi Gel ve dide bibawerîkirin. Belê evaya bi rastî ve rast têtê biderkevtin, Gava ku Merovekî ji Gel bi bawerîya xwe ve li ser vî bingehe hanê de ji xwe re dide bixewinkirin, ku dê Gel wîna bide birizgarîkirin, gava ku ji bal dujmin yanjî ji bal desthihatîyê baramberî wî karên zordarîyê bêtin bikirin. Di vê rewaş

¹Nabis ew di navbera 205 û 192 b. z. de Toran -Zordarê- Sparta bû; ew bi darêço ve û bi hemû sozên û mozên dêmagogî ve ji bona ser desthilatîyê hate bigihaştin; wehajî wî ji bona Milet bi parvekirina zevî ve dabû bisozdan. Er ji bal Achäern - Aşêern- de bi alîkarîya Romanîyan ve di dawîya dawî de hate bişikendandin, gava ku wî serdarîkirina xwest bide bimezinkirin.

hanê dê ew xwe bi pîrbûn ve nala Gracchen -Gerakxin-¹ li Roma de û Giorgio Scali -Corc Sikali²- li Florents de bi xapandi ve bide bidîtin. Belam gava ku Serdarek pişta xwe bi Gel ve dida bigirêdan, yê ku ew di fermanîkirinê de tête biliberkevtin û di mêrxasîyê de tête binavkirin, yê ku ew di demên bed de çavên xwe ji dujwarîyan nade qurmiçandin û ew li gora wan de bi pêrabûnên divayê ve ji bona çarekirina wan tête birabûn û ew di rêya mêrxasî û fermanên xwe de tevaya Gel di şahîyê de dide hiştin. Merovek wetov dê tucarî ji Gel neyête xapandin û ew dê belgeyan di nava destên xwe de bide bidîtin, ku wî li ser bingehê hîmkî de dabû biavakirin.

Gava ku serdarîyek ji rêstikeke borcuwazîyî nerm ji bona serdarîkirineke bi bêsinor di desthilatîyê de ji nişkêve xwe dide biçengkirin, weha ew xwe hergav ji bona nava tirsê dide biavêtin; jiber ku Desthilatvan zordarîyê bi destên xwe ve yanjî di rêya Karmendan de dide bikirin. Di zînetê dawî de cihê wan hergav bi lawazîtir û bi tirstir ve tête biderkevtin, jiber ku ew bes û bi tenha ve bi qencbûna vîna wan Neşîvanan ve têtin bibestandin, yê ku ew wan nala Karmendan didin bidanîn. Ev Karmendên hanê dikarin ji wan bi taybetî ve di demên tevlihev de bi hêsanîyeke mezin ve serdarîyê ji nava destên wan bidin bisitandin, gava ku ew serên xwe bi eşkere ve beramberî wan bidin bihildan yanjî gava ku ew fermanên wan li erdê de bidin bixistin. Ji bona Serdar ne bi dema rast û durust ve tête biderkevtin, ku ew di dema tirsê de serdarîkirina desthilatîya bêsinor ji bona nava lepên xwe dide biavêtin; jiber ku Neşîvan û Jêrdarên wî,

¹Tiberius -Tiberyus- û Gajus Garccus -Gayus Garkxus- Dadwervanên dadgehên Gelêrî bûn; yê pêşî ew ji bal Patriziern -Bazirgan- de (der sala 133 b. z. de) hate bikuştin, yê duwem (der sala 121 b. z. de) date bihiştin, ku ew ji bal Bendeyekî de bête bikuştin, da ku ew ji bona nava lepên dujminên xwe neyête bikevtin.

²Giorgio Scali -Corc Sikali- Bajarvanekî zengînî Florents bû. Li paş serhildana Ciompi -Kiyompi- (Hevalên di bin Rêberîya Yekekî ji Karkerên hirîyê de) der sala 1378 de cihekî mîna Şahzadeyê li bajarê Florenz -Florents- de bi destên wî ve hate bikevtin. Lêbelê wî xwe jiber reftarîyên xweyî şermezarî ve ji Gel date bidûrkirin û ew (der sala 1388 de) li sêpîyê de hate bixistin.

yên ku ew hatine bireweştkirin, ku ew ji Karmendan fermanên xwe bidin biwergirtin, dê li fermanên wî de di demên tengavîyê de nedin biguhdarîkirin; dê ew di demên tevilihev de hergav xwedanê kêma Kesana bête bidîtin, ji yên ku ew dikarin bi wan ve bide bibawerîkirin; jiber ku heryek xwe ji bona wî dide binêzîkkirin, heryek jê re dide bisozdan, heryek dixwaze xwe jê re bide bigorîkirin, tanî ku mirin serê xwe nede bihildan. Lêbelê di demên tevilihev de, gava ku serdarî bi niyazmendî Neşînvanan ve tete bidîtin, wêçaxê bes û bi tenha ve kêma têtin bidîtin. Ev serpêhatîya hanê weha bêtir bi tirstir ve tete biderkevtin, jiber ku Merov wêna bes û bi tenha ve yekcarê dide bikaranîn. Jibervêjî divê Serdarekî jîr ji xwe re li ser de bide biremankirin, bê ka çi pêrabûn jê re bi pêwistî ve têtin bidîtin, da ku pê Neşînvana wî hergav û li jêr hemû zînetan de bi dewletê û wî ve bêtin biniyazmendîkirin; dê wêçaxê ew ji bona wî hergav serên xwe bidin bitewandin.

Derîyê Dehem

Çawan Merov dikara xurtbûna her Serdarîyekê bide bipîvandî

Belê em niha ji bona ser Commodus -Kommodus- têtin biaxivtin, yê ku ji bona wîna zor bi hêsanî ve dihate biderkevtin, ku ew serdarîkirina xwe bide biragirtin. jiber wî ew nala Kurê Markus bi şêwekî rewayî ve ji xwe re date bişûngirtin. Ji wî re bes û bi tenha ve dihate bipêwistkirin, ku ew li ser şopa Bavê xwe de bida çûyîn û wer dê Serbaz û Milet pê bihatana bişakirin. Lêbelê jiber ku ew dir û nemerovan bû û da ku ew talankarîya xwe beramberî Milet bikaribe bide bikirin, wî ew rê ji xwe re date bigirtin, da ku ew Leşker ji xwe re bide biqazanckirin, wî hefsarê wî jê re date biberdan. Ji rexê din jî de wî nikarîbû avrûwa xwe bida bigirtin û ew pir caran jî ji bona tiradê dihate bidakevtin, da ku ew ligel Gladiatoren¹ -Şervanan- de bide bişerkirin û wî karên dinî nizimtir didan bikirin, yên ku ew ji bona Mezinaya Qeyser pir nizim dihatin bidîtin, wer wî xwe di nava çavên Serbazan de didate bipîskirin. Ew ji bal bendekê de dihate bikîndarîkirin û ew ji aliyê benda din de bi pîskirî ve dihate bidîtin. Di der pêrabûna tepekê ve ew hate bikuştin.

Hêjî maye bihiştin, ku Merov li ser nîşanên rûçikên Maximin - Maksimin- de bide biaxivtin. Ew pir bi xwedanê serûştîyeke cengbazî ve bû. Jiber ku ji bona Leşker venermkirina Iskender² bi sergêjî ve dihate biderkevtin, -min li jor de li ser de dayite bixeberdan-, wan ew li paş vekuştina wîna de ji bona ser Text dane bihilkişandin. Belam wî ev bi dirêjî ve ji xwe re nikarîbû bida biragirtin; jiber ku du tiştan ew bi kîndarî û pîsî ve dane bikirin: Carekê, jiber ku ew ji Maleke berjêrbû û wî berê li Tirakya de şivanî dida bikirin. -Ev bi giştî ve dihate nasîn û wê navê wî di seranseriyê de dida bibedkirin-. carekê din, jiber ku wî navekî bêsinorî dirbûnê ji xwe re dabû bipeydakirin. Belê wî di destpêka serdarîya xwe de serdana Roma û biwergirtina Textê Qeyseriyê date bipaşvexistin û wî di rêya Ostandarên xwe de li Roma û hemû Cihên dînî Imperatoryê -Şahîşahîyê- de pir dirbûn

¹Wî biserkevtinên xwe li ser Gladyatoran de di salnameyan de didatin binivîsandin. Merov ew bi navê Herkulesê Romanî ve dida binavkirin.

²Alexander Severus bi carekê ve li jêr kêra Dêya xwe, Zanistvanê Mafeyî Ulpianus û Nivîsvanê mêjûwê Diocassius de dihate bidîtin. Merovanîya wîna ji bal Prêtorîyan de dihate bikîndarîkirin.

hiştin bêtin bikirin. Weha ew jiber koka wîyî sade de ji bal tevaya Milet dihate bêrûmetkirin û jiber tirsê wîyî nemerovanîtyê de ew dihate bikîndarîkirin. Li ser vî encamê hanê de di pêşî de Afrika¹ serê xwe date bihildan, di pişt re Civatapîremerdan ligel Miletê Roma de û herwehaji tevaya Italya tepkirina xwe dijî wî dane bigerandin. Ligel van de Leşkerê wî bi xwe jî ve xwe date bitevlêkirin. Gava ku vîna li Aquilâa -Akviyulêa- de dor lê date bigirtin û ligel vegirtina wêna de dijwarî li ber xwe de datin bidîtin. Leşker ew date bikuştin; jiber ku ew ji dirbûnên wîna de dilên wan dihate bixelandin û jiber bêjimarbûna Dujminên wîna de ew nema bêtir jê dihatin bitirsandin.

Ez nema dixwazim li ser Heliogabal -Helyogabal- neji li ser Macrinus -Makrinus- û neji li ser Julian -Culyan²- de bidim biaxivtin, yê ku ew di encamê vepîskirina gîştî de zû hatin biwindakirin, lêbelê ez niha ji bona ser encamkirina van temaşekirinan tîm bigerandin. Li vêderê de didim bihîmkirin, ku Serdarên rojên me kêr dijwarîyan li ber xwe de didin bidîtin, ku ew di berê Femandarîya xwe de Serbazan bi destikên bêsnorkirî ve dikarin bide bidilxweşkirin. Heger ku ew ji bona van Serbazan jî hinekî divên guhpêdanê pê bidin bikirin, weha ev belê xwe dihêle bi hêsanî ve bête bikirin; jiber ku hîç Kesek ji Desthilatvanên îro de bi xwedanê Leşkerekî ve nayêtin biderkevtin, yê ku ew weha ligel serdarî û serpereştîya welête de ji kevnar de tete

¹Meletê Afrikî Marcus Antoninus Cordianus ji bona ser Textê Qeyser date biberzkirin, yê ku ew nal Pîremerdeki Romanî û di wêçaxê bi Serdarê Afrika dihate bidîtin. Belam wî zû xwe date bikuştin, li paş ku Kurê wî ji bal Hevalbendeki Maximin de hate kuştin. Gava ku Maximin xwe ji bona ser Roma date bikişandin, Civatapîremerdan du Pîremed ji bona dijî Qeyser dane binavkirin.

²Rêza li dûhevhatina demê de li vir de nehatîye bibiparastin. Macrinus li dû Caracall de hat, yê ku wî xwe bi destên xwe ve date bikuştin. Jiber ku ew bi carekê ve bêtuwana bû, Serbazan Heliogabal, yê ku ew Keşeyekî Surî bû, ji bona ser Text dane biberzkirin, yê ku ew jî li paş çarsalên serdarîkirinê de di sala 222 Z. de hate bikuştin. Li paş vî de Alexander Severus ji bona serdarîkirinê hate bidîtin. Li paş mirina vî de jî Didius Julianus Textê Qeyserîyê ji xwe re date bikirin.

bibestandin, mîna ku ev li nik Leşkerên Imperatôrîya Romanî de dihate bidîtin. Heger ku di wêçaxê de bi pêwistî dihate biderkevtin, ku divabû Merov Serbazan bêtir ji Milet bide bidilxweşkirin, weha evaya jibervêjî dihate bidîtin, jiber ku ji bona Serbazan kêrdarîyeke mezintir ji ya Milete dihate bidîtin. Iro biservajîvêji ve ji bona hemû Serdaran ji bil Turkan û Sultan¹ ve bi pêwistir ve têtê biderkevtin, ku ew Milet bêtir ji Serbazan bidin bidilxweşkirin; jiber ku li nik Milet de di îro de desthilatîyeke mezintir ji ya Serbazan têtê bidîtin.

Ji vêna ezê SerdarênTurkan ji nava wê bidim biderxistin, jiber ku ew hergav 12000 Peyade û 15000 Suwar li dor û berên xwe de dide bidîtin û bi vanan jî ewlebûn û xurtbûna serdarîkirina wîna têtê bigirêdan. Ev Serdarê hanê divê di bin hemû merc û zînetan de dostanîya wan ji xwe re bide biparastin. Herwehaji jiber ku bi vî hawayê hanê jî ve tevaya Padîşahîya Sultan jî bi carekê ve di nava lepên Serbazan² de têtê bidîtin, wer divê ku Sultan jî bi bêguhpedana bi Melet ve ligel wan de dostanî xwe bide bibiparastin. Li vêderê de divê bête biliberkevtin, ku serdarîkirina Sultan xwe ji hemû bingeheên dewletên din de dide bicudakirin. Ew nala serdarîkirina Papê Filan têtê biderkevtin, ya ku Merov wê nedikare mîna Serdarîkirineke Lidûxwehiştî û neji wê nala Serdarîkirineke nuhî wergirtî bide binîşandan; jiber ku ne Kurên Serdarê kevin bi Şingirên Bavê xwe ve têtin biderkevtin û ew bi Mîrzan ve têtin bihiştin; hêjîbêtir dê Sultan ji bona vî cihê hêja ji bal wan Kesan de bête bihildan, ji yên ku di nava destên wan de desthilatî têtê bidîtin. Jiber ku evaya ji dam û dezgehekî kevnar de têtê biderkevtin, Merov nikare li serserdarîkirineke nuhî wergirtî ve bide biaxivtin, jiber ku li nik wê de hin ji dijwarîyan nayêtin bipeydakirin, yên ku Merov wan li nik serdarîkirinên nuh de

¹Ji xwe re li derîyê çarem bidin bitemaşekirin. Li nik Turkan de Leşkerekî hergavî dihate bidîtin, di nava wî jî de Yanîşarî dihatin biderkevtin, yên ku ew der sala 1329 de nala Pasevanên taybetîyî Sulatan hatin bipeydakirin, yên ku ew li Ewropa de dihatin binavûbangkirin. Mebest li vêderê de Sulatnê Misrê têtê biderkevtin, yê ku Padîşahîya wîna ji bal Turkan de der sala 1517 de jê hate bisitandin.

²Mîna li jor de li nik Sultanê Misrê de dihate bidîtin.

dide bidîtin. Hegerjî ku Serdar bi nuhî ve tète biderkevtin, weha belê rêxistina vê dewleta hanê bi kevnar ve tète biderkevtin û ew wetov hatîye biavanîkirin, mîna ku Mîrzayê nuh ji xwe re şûna Text ji Bav û kalan de dayite bigirtin.

Belê em ji bona ser danava xwe careke din bêtin bizîvirandin. Her Yekek dê bide bidîtin, yê ku ew ji xwe re li ser raxistinên jorî de bide binêrîn, ku Kîndarî yanjî pîsîfî bi hoyên nemankirina wan Qeyserên bi navkirî ve hatin bidîtin. Hêjîbêtir dê ew wî bingehî ji xwe re bide binaskirin, çima ji wan Qeyseran¹ tevan bes û bi tenha ve yek bi dawîyeke bextiyarî ve hate bişakirin, yê din ku wan ji xwe re ev rê yanjî rêyeke dinî biservajîvêjî ve dabûn bigirtin, hemû bi dawîkirineke dilşikestî ve hatin bidawîkirin. Jiber ku ji bona Pertiniks û Iskender bi hawakirina wan ji bona Mark Awrêl, yê ku wî şungirîya serdarîkirinê bi şeyekî rewa ve ji xwe re li paş Bavê xwe date biwergirtin, di serdarîkirina xwe de bi nebaşî ve û bi zîyan ve hatin biderkevtin, yê ku ew herdu nala Hilkişvanên nuhatî ji bona ser Textê serdarîkirinê dihatin bidîtin. Herwehaji hawakirin ji bona Karakall, Kommodus û Maksimin jî bi genîbûn ve hate biderkevtin, gava ku wan ji xwe re hawakirina Veverus dane bikirin, jiber ku li nik wan de jêhatîbûna gewreyî mezin nedihate bipeydakirin, ya ku ew divabû bihata bidîtin, da ku wan bikaribana li ser şopa wîna de bidana biçûyîn. Jibervêjî Serdarekî nuh di Padîşahîyeke sazkirîyî nuh de nikare ji xwe re rêya Mark Awrêl bi nimûne ve bide bigirtin û herwehaji divê ew ji xwe re rêya Severus jî nede bigirtin; lêbelê divê ew ji bona xwe ji Severus wê bide biwergirtin, ya ku Merov ji bona sazkirina serdarîkirinekê bi pêwistî ve tète bidîtin û divê Merov wê ji Markus bide biwergirtin, ya ku ew bi başî ve tète bidîtin û pir bi nav û deng ve tète bidîtin, da ku Merov bi wan ve dewleteke heyî û hîmkî bide biragirtin.

¹Pertinax û Alexander van herdu Hilkişvanên nuhî ber bi jor ve ji bona xwe dane bizîyanîkirin, jiber ku wan ji xwe re rêça nermbûnê dane bigirtin, ya ku ji xwe re Şungirê Textê rewayî Marc Aurel dabû bigirtin. Caracalla, Commodus û Maximin ji bona xwe dane bizîyanîkirin, jiber ku wan ji xwe re rêça dirbûnên nimûneya Severus dane bigirtin, bêyî ku ew bi xwedanê jêhatîbûna wî ve bêtin biderkevtin.

Derîyê Bîstemîn

Magelo avanîkirina Kelehan û pir pêrabûnên din, yên ku ew heroj ji bal Serdaran de têtin bikaranîn, bi kelk yanî bi bêkelk ve têtin biderkevtin.

Hinekan ji Serdaran ji bona mebesta ewlebûnadewleta xwe Jêrdarên xwe dane bêçekkirin; hinên din di nava deverên vegirtî de neyebûna Neşînvanan dane bigûrkin; hinên din dujminayeti beramberî xwe bi xwe ve didane bivêxistin, hinekan jî dest pê dane bikin, ku ew wan Kesan ji xwe re bidin biqazanckirin, yên ku ew ji bal wan de di destpêkirina serdarîkirina wan de bi lêgûmankî ve dihatin biderkevtin. Hinekan ji xwe re Keleh dane biavakirin, hinên din ew dane bitextkirin û biwêrankirin. Tevîjî Merov nedikare li ser van hemû pêrabûnan de dadwerîyekê bide bidan, bêyî ku Merov li ser pêwendîyên taybetîyî dewletê de bide biaxivandin, di wê dewleta ku biryarîyên wetov têtin bibiryardan. Ez dê belê bi şeweyekî kêmi giştî ve li ser danavê de bidim biaxivtin, li gora ku dananav dihêle bête bikin.

Hêjî tucarîjî Serdarekî nuhî ji bona ser desthilatîyê hatî Jêrdarên xwe nedane bêçekkirin; hêjîbêtir wî ew hertim dane biçekkirin, herger ku wî ew bêçek dane bidîtin. Belê heger ku tu wan bide biçekkirin, wehajî dê tu bi Mîrzayê ser wan ve bête bikin; yên ku ew ji bal te bi lêgûmankirî ve dihatin biderkevtin, heger ku tu wan bide biçekkirin, dê ew bêtir bi te ve bêtin bigirêdan û dê ew ji bona te bi dilsoz ve bêtin bimayîn. Weha tu Jerdarên xwe bi Hogirên xwe ve dide biveguhertin. Bi serûştî ve tete bidîtin, ku Merov nikare tevaya Jêrdaran bide biçekkirin. Herger ku tu wan ji xwe re bide biçekkirin, yên ku dilê te ji wan re dide bixwestin, wisa tu dikare ligel yên din de

bide bireftarîkirin, li gora ku ewlebûna te dide bidaxwazîkirin. Gava ku Çekhilgirtvan di reftarîkirinê cudabûnê didin bidîtin, weha ew girêdana xwe bi te ve bêtir didin bihestkirin. Yê din li reftara te de têtin bilêbuhurandin, jiber ku ew didin bidîtin, ku yê ew ji xwe re divên kiryeke bilindtir bidin biwergirtin, jiber ku ew metirsîyeke mezintir û erkekî bêtir li ser xwe de didin bihilgirtin. Belam heger ku tu Jêrdaran bide bibêçekkirin, weha pê tu dide bidestpêkirin, ku tu wan dide birûsarîkirin, ku tu bawerîya te çî ji tirasa te yanî ji gûmana te bi wan ve nayête bidîtin. Ev herdu jî ji bona dijî te kîndarîyê didin biencamkirin. Jiber ku tu xwe nikare bêçek bide bihiştin, ji bona te tiştêkî din pêve nema tête bidîtin, ji bil ku tu ji xwe re Peyan bi kirê ve bide biwergirtin, ji yê ku ez li jor de li ser rûçikên wan de hatime biaxivtin. Hegerjî ku ev bi xwe jî ve bi jêhatî ve bêtin derketin, lêbelê weha tu nikare wan bi wêjimarê ve bide bixwedîkirin, ku ew te ji Dujminekî xurt û herwehajî pêrejî ji lêgûmankirên Jêrdaran bidin biparastin.

Jibervêjî ve, mîna ku min ew jiberê de dayite bigotin, Serdarekî nuh di serdarîkirineke wergirtîyî nuh de dê hergavjî ji bona bipeydakirina Sipah bête bipêwistîkirin. Li ser vêna de gelek nimûne di mêjûwê de têtin bipeydakirin. Belam heger ku Serdarekî devereke nuh ji xwe re date bivegirtin, yê ku ew wî bi ser welatê xweyî kevin ve dide bivekirin, weha divê ku ew Neşînvânê devera nuh bide bibêçekkirin. Ji vê rêzana hanê ew Kes têtin biderkevtin, yê ku ew li nik vegirtina te de ji bona alîyê te hatibûn birabiwestandin. Herwehajî van jî divê ew bi derbasbûna demê ve li nik kêsên cudan de bide binermîkirin û bijînanîkirin¹ û weha divê ew bide birêvexistin, ku hemû çekên tevaya jêrdesthilatîya wî bes û bi tenah ve di nava destên Serbazên wî de bêtin bicivandin, yê ku ew di nava dewleta wîyî kevin de li dor û berên wî de dihatin bijîyandin.

Bav û Kalên me, bi taybetî ve yê ku Merov wan bi jîr ve dide

¹Ev rêzana hanê Romanîyan der reftarîkirina xwe de ligel Yunanîyan de û Spanîyan ew ligel reftarîkirina xwe de ligel Neapolînîyan de û herwehajî bi carekê ve Serdarê bêgane ew beramber tevaya Italyan didan bikaranîn.

bidanîn, bi amojgarî ve didatin bigotin, ku Merov divê Pistoja di rêya Bendan de û Pisa di rêya Sengeran de bide bizalkirin. Jibervêjî ve wan di nava hin bajarên di bindestên xwe de qayîş û berberîya di navbera bendan de didatin bigûrkirin, da ku ew wan bi baştir ve bikaribin bidin biragirtin. Dibe, ku evaya di wê demê de rast hatibe biderkevtin, gava ku Italya xwe tanî radeyekî di tirazûkirinê de didate bidîtin¹. Belam ez nadim bawerkirin. ku Merov vê îro nala serpêhatîyekê ji xwe re bikaribe bide biwegirtin, ku jiberberîya bendan de carekê ji caranjî tiştêkî baş xwe dayite biçengkirin; hêjîbêtir ew bajar bi neçarî ve têtin biwindakirin, yên ku ew di rêya berberîya bendan de hatine bizîvarîkirin, gava ku Dujmin xwe ber bi wan ve didin nêzîkkirin; jiber ku dê hergav benda lawaztir xwe bi ser alîyê desthilatîya derve ve bide biwergêrkirin û bi vî corî ve dê benda din li ser desthilatîyê de nema bikaribe xwe bide biragirtin.

Li gora bîr û bawerîya min de Vênêtsiyaniyan jiber bingeheên gotîyî jorî de di nava bajarên bindestên xwe herdu bend, benda Guelfen û Ghibellinen² didan bipitgirtîsin. Tevî ku wan jî tucarijî nehiştin, ku xwîn bête birijandin, lêbelêjî wan berberî di nava wan de didan bigûrkirin, da ku ew Bajarvaniyan bi pevçûnên di nava xwe de bidin bikarkirin û rê li ber wan de bidin bigirtin, da ku ew xwe nikaribin bi yekbûn ve beramberî wan serên xwe bidin bihildan. Vêna, mîna ku Merov dide bizanîn, ji bona gihandina berjewendîya wan neda bitêrkirin; jiber ku xweser li paş şikestina wan de li nik Vailâ - Vailê³- de perçeyekî ji van bajaran¹ de di xwe de mêrxasî datin bidîtin

¹Evaya di pêla Lorenzo Magnifico (1449 tanî 1492 de) bû. Wî ji bona wekhevbûna giranbûnê li Italya de dida bixebatkirin, ya ku ew di wê pêlê de ji bona pênc avaniyên dewletîyî mezîni hatibû bijihevkevtin, li jêr de Padîşahiya Neapel, di navrasta Italya de Dewleta Kenîştê, di jorîrojhilat de Komara Venedig - Vênêtsiya-, di jorîrojawa de Mîrneşîniya Mailand -Mayland- û ji hemû aliyên yên din de dorlêkirin Komara Florenz -Florens- dihatin bidîtin.

²Di teva pêla sedsalên navînî de bajarên Italî di nava van herdu bendan de dihatin biperçekirin. Ghilbellinî ji dilsozên Qexser (ji hevalbendên Mezinbûna Staufe - Şitawfin-) dihatin biderkevtin û Geulfen ji Hevalbendên Papa dihatin biderkevtin.

³Di 14. gulana Sala 1509 Vênêtsiyani der şerê li nêzika Vailâ -Vailê- de ji bal

û ku wan xwe ji serdarîkirina wan bi carekê ve dane bidawîşandin. Jîbervêjî ve rêyên wetov hergav bi nîşana lawazîya Serdarekî ve têtin biderkevtin; jiber ku di nava dewleteke xurtî bi hêz ve derzên wetov dê rê bi wan ve nehêlin bêtin bidan. Belê ew bes û bi tenha ve di demên Aştîyê de kelkê didin bianîn, jiber ku Merov bi alîkarîya wêna ve dikare bi hêsanî ve li ser Jêrdaran de bide serdarîkirin; lêbelê di cengê de rêyên wetov xerabîyên xwe didin bixuyanîkirin.

Bêgûman dê Serdar bêtin bimezinkirin, gava ku dijwarî û bergirên ber wan bêtin bihilbianîn, yên ku ew xwe ji bona ber pêşîya wan didin biavêtin. Bext ji bona Serdarekî, nemaze gava ku ew dixwaze Yekekî Hilkişvanîyî nûhatî bide bimezinkirin, yê ku ew bêtir bi niyemendî ve ji bona nav ji mîna yekekî Şûngirê Padîşahekî têtê biderkevtin, Dujminên wî jê re rû bi rû ve dide bikirin û ew wî ligel wan de dide bişerkirin, da ku ew ji bona wîna kêşê pê bide bidan, ku ew wan bide şikenandin û ew ji bona ser nêrdewanê bilindtir bête bihilkişandin, ya ku Dujminên wîna jê re jiber xwe ve dabûn bidanîn. Jîbervêjî ve pîr Merov dê di wê bîr û bawerîyê de têtin bidîtin, ku Serdarekî jîr, gava ku jê re kêseke wetov têtê biderkevtin, divê ji xwe re bi fêlbazî ve Dujminekî ji Dujminan bide bipeydakirin, da ku ew zora wî bide birin û ew wer bi vî rengê hanê ve ji xwe re navekî berztir bide biwergirtin.

Desthilatvan û nemaze yên ku ew nuh ji bona serdarîkirinê hatibûn bigihaştin, wan li nik wan Merovan de, yên ku ew li nik destpêka serdarîkirina wan de lêgumankirî dihatin biderkevtin, hergav bêtir hogirî û kelk ji xwe re didatin bidîtin, ji li nik yên ku wan di pêşîya pêşiyê de bi wan ve ji xwe re didan bibawerîkirin. Pandolfo Petrucci² Serdarê Siena -Siyena- di serdarîya xwe de bêtir pişta xwe ji

Hevgirêdana Cambrai -Kambrayi- de, ya ku ew der sala 1508 de di navbera Firensa, Sipanyan, Qeysere Germanî û Papa de hatibû bigirêdan, hate bişikenandin. Ji xwe re li Deryê Yanzdehemîn de bidin bitemaşekirin.

¹Evanan Verona, Brescia -Breskiya-, Vicenca -Visinka, û Padua bûn, yên ku hinekan ji wan xwe ji boa ser rexwê Qeysere Geramnî û yên din xwe ji bona ser rexê Firensiyî datin biavêtin.

²Pandolfo Petrucci (1450 tanî 1512 de) der sala 1500 bi Mîrzayê Siena -Siyana- ve hate bikirin, li paş ku wî Nocolò Borghese -Nikolo Borghêse- date bikuştin û ew bi

Merovên din bi wan Merovan ve dida bigirêdan, ji yên ku ew di pêşî de li bal wî de li wan de dihate bigûmankirin. Lêbelê Merov nikare li vê rûdanan hanê de bi dirêjî ve bide bitemaşekirin, jiber ku ew li gora zînetan de bi cudanbûn ve tete biderkevtin. Ez dixwazim bes yekekê bidim birûnkirin, Ku Serdarek wan Merovan, yên ku ew ligel wî de di destpêkirina serdarîya wîna de bi Dujmin ve jê re dihatin bidikerkevtin, hergav bi hêsanî ve ew dikare wan ji xwe re bide bikarkirin, gava ku ew ji xwe re piştgirtinekê ji bona girawkirina jîyandina xwe didin niyazmendîkirin. Evanan ji alîyê xwe de weha deha bêtir têtin bineçarkirin, ku ew ji bona wîna bi dilsoz ve bêtin biderkevtin, çend bêtir ku ew divabûnê bidin binaskirin, ku ew di rêya kirinan de dikarin bîr û bawerîya wîyî neqenc li ser xwe de bidin bimalandin. Weha bi vî rengê hanê Serdarek ji vanan hergav bêtir ji xwe re qazancê ji yên din dide bidîtin, ji yên ku ew bi pîrbûn ve bi dilsozîya wan ve dida bibawerkirin û yên ku ew berjewendîyên wîna di ser guhên xwe re didin biavêtin.

Jiber ku ev danava hanê dide bidaxwazkirin, ez naxwazim ji destên xwe wê bidim biberdan, bêyî ku ez wan Desthilatvanan bidim bibîrxistin, yên ku wan dewletek bi alîkarîya Neşînvânên wê ve li pêş demeke kurt de ji xwe re dane bizeftkirin, divê ku ew ji xwe re rast û durust bi hûr û kûrî ve li hoyên hêsanîkirina kar û barên pêrabûnên xwe de bidin bitemaşekirin. Ew ne jiber hogîrîya serûştî jê re lêbelê jiber vê hatîye birûdan, jiber ku ew ligel wê Serdarîya hanê de ne dihatin bidilxweşikirin, weha dê Serdarê nuh bes û bi tenha ve ligel westandineke mezin û dujwarîyan de bikaribe ji xwe re dostanîya wan bide biragirtin, jiber ku dê ji bona wîna bigir nikaribe bête bikirin, ku ew wan bide bidilxweşikirin. Merov li ser nimûneyên kevnaî û nuhî mêtîwê de li ser hoyê vîna de lêbide bikolandin, weha dê Merov ji

serê Tepvanê Magione -Magyonê- ve dihate biderkevtin. Mikavili ew bi xwe ve dida binaskirin, jiber ku ew sê caran li nik wî de li Siyena de nala Nardvan dihate bidîtin. Wî ew nala Merovekî didate bixuyanîkirin, yê ku ew di zînetaxweyî dijwar de bi kosetîyeke pîrî bilnd ve di qulupazîyên fêlbazî de dihate biliberkevtin. Petrucci li ser fermana Sezarê Borgiya de hate bisergonkirin, belam ew li paş demeke kurt de careke din bi alîkarîya Firensiyân ve ji bona Siyana hate bigerandin. Kurê wî, yê ku ew li paş mirina wî de ji bona ser serdarîyê hate bikevtin, ji bal Papayê Medici Leo X. -Liyoyê Dehemîn- de serdarîkirina wîna jê hate bisitandin.

xwe re bide bidîtin, ku dê ji bona Serdarekî gelekî bi hêsanîtir ve bête biderkevtin, ku ew wan Kesan ji xwe re bi Dost ve bide biqazanckirin, yên ku ew ligel wê serdarîkirina berê de bi dilxweşî ve dihatin biderkevtin û ew jibervêjî ve bi Dujminên wî ve dihatin biderkevtin, ji yên ku ji bêdilxweşîkirina xwe ji bona wîna bi Dost ve hatin bikirin û yên ku wan ji bona wêna li nik vegirtina serdarîkirinê de pişt lê datin bigirtin¹.

Li nik Desthilatvanan de bi reweştî ve têtê biderkevtin, ku wan ji bona gewrekirina ewlebûna serdarîkirina xwe sengeran nala bend û bestan ji bona wan Kesan bidin biavakirin, yên ku wan bi dizî ve ji bona wan mebestên Dujminatîyê didan bihûnandin û herwehajî pêrejî da ku ew sengerên hanê di rudana hêrîşkirineke ji nişkê ve ji bona ser wîna bi cihekî ewleyî penabûnê ve jê re bête biderkevtin. Ez van pêrabûnên hanê didim bipesindan²; jiber ku ew ji kevnî kevnar de bi reweştî ve têtin biderkevtin. Tevîlvêjî de di van rojên me jî de Mîrza Noccló -Nikolo- Vetelli³ du senger li Citta di Castello -Sita di Kastello⁴- de datin bitextkirin, da ku ew welêt ji xwe re bide biragirtin.

¹Mikavili bi vê ve rast û durust dixwaze ji bona Medici bide bidiyarkirin, ku ew ji bona karên wîyî dilsozkirî ji bona xwe tevî dujminatîya wêyî berê jî dikarin piştta xwe pê bidin bigirêdan.

²Bi giştî ve di çavên Mikavili de senger hatibûn bikevtin, yên ku Merov ew ji bona liberxwedana hêrîşên derveyî didan biavanîkirin, jiber ku li gora bîr û bawerîya wîna de wan mêrxasîya Siphon didan bikêmkirin. Belam wî karina wan ji bona parastina beramberî serhildana Jêrdaran dida bidîtin.

³Serekê Peyan Nikolo Vitelli bi alîkarîya Medici ve bi Mîrzayê Cittâ de Castello-Sitê d de Kastello- ve hate bikirin. Der sala 1474 de Papa Sixtus IV. -Sikstusê Çarem- ew date biderkirin. Belam ew der sala 1484 de li paş mirina Papa de careke din vegerandin. Wî herdu sengerên ji bal Papa de avakirî dane bitextkirin, jiber ku ew di wê bîr û bawerîyê de bû, ne ku senger lêbelê hogirîya Milet jê re dê wîna bi xwedanê serdarîkirinê ve bikaribe bide bihiştin (Discorsi II. 24).

⁴Guido Ubaldo Fermanrewayê Urbino (1482 tanî 1508 de) di zemanê xwe de yekekî gelekî hêjayî ji Serokên Peyan dihate bidîtin. Ew der sala 1502 de ji bal Sêzarê Borgiya de hate biderkerin û ew ji bona Vênêtsiya hate bipenakirin. Li pas mirina Papa

Guido Ubaldo Fermanrewayê Urbino li paş zîvirandina xwe ji bona ser serdarîkirina xwe de, ji ya ku ew ji ser wê ji bal Cesare Borgia - Sêsarê Borgiya- de hatibû biderkirin, tevaya sengerên welatê xwe bitextkirin. Ew di wê bîr û bawerîyê de bû, ku bi bêyî sengeran ve windakirina Serdarîkirinê deha bi dijwarîtir ve têtê biderkevtin. Malbate Bentivoglio -Bentivogilyo¹- jî li paş vegerandina xwe ji bona Bologna de wan jî mîna wî dane bikirin. Weha Senger li gora zînetan de bi qenc yanjî bi xerab ve têtin biderkevtin. Heger ku ew ji bona te ji rexekî de bi kelk ve têtin biderkevtin, wer ew ji bona te ji rexekî din de bi ziyar ve têtin biderkevtin. Merov dikare li ser vîna de wetov bide bigotin: Serdar, yê ku ew bêtir ji Miletê xwe ji mîna Desthilatîyên Bêganî têtê bitirsandin, divê ew sengeran ji xwe re bide biavakirin; Lêbelê kî bêtir ji Desthilatîyên derve ji mîna Miletê xwe bête bitirsandin, divê ew dev ji wan bide biberdan. Keleha Mayland, ya ku ew ji bal Fransisko Sforza de² hate biavakirin, wê bêtir ji bona Mala Sforza³ ceng dane bivêxistin û dê ew hêjî wan ji hemû nearamîyên hundur bêtir bide bigûrkirin. Başîrîn senger, ji yê ku ew têtê bidîtin, gava ku Merov li ber çavên Milete de neyête bireşkirin. Heger tu jî bi

Alexander VI. -Iskenderê Şeşem- de û jihevkevtina serdarîkirina Sêzarê de ew der sala 1503 de careke din hate bivegerandin û wî sengerên Cubbino -Kobino- û Pergola dane bitextkirin.

¹Lişunvanên Giovanni Bentivoglio -Giyovanni Bentivogliyo-, yê ku ew ji bal Papa Yulyusê Duwem de der sala 1506 de ji Bologna hate biderkirin û ew di sala 1508 de der penabûna xwe de hate bimirin, ew der sala 1511 de careke din hatin bivegerandin û wan Sengera Porta Galliera -Gallîra- ya ku ew ji bal Papa de hatibû biavakirin, dane bitextkirin.

²Fransisko Sforza (1582 tanî 1508 de), ji xwe re li derîyê yekem de bide bitemaşekirin, Kurê Şervanê Serokê Peyan û Zavayê Flippo Visconti -Viskontîyê Fermanrewayê Mayland bi sazvanê Mîrneşînîya Mala Sforza ve hate bikirin, ya ku wê ji sal 1450 tanî 1540 de li Mayland de date biserdarîkirin.

³Bi bawerîya Sforzan ve bi sengerên xwe ve wan ligel Milet de bi bedbûn ve didan bireftarîkirin; jîbervêjî ve Milet ji bona Frensîyan nala bi Rizgarên xwe ve li wan de dane bipêşwazîkirin.

xwedanê sengeran jî ve bête biderkevtin, belam li ber çavên Milet de tu bête bireşkirin, weha dê ew nikarin te bidin birizgarîkirin; jiber ku heger Miletêkî carekê ji bona çekan destên xwe date biavêtin, wisa hergav ew ji xwe re Desthilatîyeke Bêgane dide bidîtin, ya ku ew ji bona wî dide biyarmetîkirin. Di vî zemanê me de, mîna ku merov ji xwe re dide bidîtin, senger bi kêrî tu Serdarekî ve ji bil Şehzadeya Forli¹ piştî mirina Mêrê wêna Şahzade Girolamo² pêve nehatin bikin; ya ku wê di sengerê xwe de dikarîbû xwe jiber hêrişê Milet bide rizgarîkirin, ji bona hewara Mayland bide biçavdêrîkirin û serdarîkirina xwe careke din ji xwe re bide bigerandin³. Zînet di wêçaxa hanê de wer bû, ku tu Desthilatîya Derve nikarîbû alîkarîya Milet bide bikin. Belam li paş jî de sengeran jî jê re kêr dane bikêrkin, gava ku Sêzarê Borgiya⁴ ji bona ser wê xwe date birakişandin û Miletê Dujminê wêna xwe ligel rexê Bêgane de date biavêtin. Weha dê ji bona wêna di zemanê çûyî û yê niha jî de hogirîya Milet jê re bi parastinek ewletir ve ji xwedanîya sengerên wê de bihata biderkevtin. Heger ku Merov li van tevan de dide bitemaşekirin, weha ez pesnê wî didim bikin, yê ku ew sengeran dide biavakirin, werjî bi wî corî ve jî ez wî didim bipesinandin, yê ku ew wan nade biavakirin; lêbelê ez rexne li heryekî de didim bigirtin, yê ku ew bi bawerîya xwe bi sengeran ve çavreşîya Milet bi kêmbûn ve guh pê dide bidan.

¹Evaya Catarina Katarina- Sforza bû.

²Li paş kuştina Mêrê wênayî Maqûlê Girolamo Riaro -Riyaro- de der 14. nîsana sala 1488 de ew ligel Zarokên wêna de bi Dîlîti ve hate bigirtin. Belam wê bi fen û xapandinê ve dikarîbû xwe ji nava lepên Tepvanan de bide rizgarîkirin û ew ji bona nava keleha xwe bide bibazdan.

³Mamê wêna Ludvico -Ludviko- il Moro Fermanrewayê Mayland Katarina date birizgarkirin û wî ew careke din ji bona ser serdarîkirina wêna li ser Imola û Forli date bidanîn.

⁴Sêzarê Borgiya di 19. çileyê pêşin de sala 1499 de ji bona Forli hate gihastin û wî di 28. çileyê pêşî de xwe ji bona ser senger date bikişandin, yê ku di nava wî de Katarina xwe dabû bipenakirin. Dorlêgirtinê bes tanî 12. çileyê paşin de der sala 1500 de date bidirêjkin; li pas vê de ew ji bona nava destên Sezarê de hate bikevtin.

Derîyê Bîstûyekem

Çi divê Serdarek ji xwe re bide bikirin, da ku ew bête binavûdengkirin

Hîç tiştêkî din ji bona Serdarekî weha navekî mezintir ji bil kar û barên pêrabûnên girng û nimûneyên bêhempa didin bipeydakirin, yên ku ew wan di rêya reftarîkirinên xwe de dide bikirin. Em vanan di vê dema xwe de li nik Ferdinandê Aragonî¹ Padîşahê Spanyayî niha de didin bidîtin. Merov dikare li ser wî de bigir bide bigotin, ku ew bi nuhî ve ji bona ser serdarîkirinê hatiye bigihaştin; ji ber ku ew ji Şahzadeyekî bêdesthilatî di rêya navnîşana navê xwe de ji bona Serdarekî tekane di filetîyê de hatiye bikirin. Heger ku Merov ji xwe re li kirinên wî de bide bitemaşekirin, wer Merov dê ji xwe re bide bidîtin, ku ew hemû bi giring ve û hin ji wan bi carekê ve bêqam bilind têtin biderkevtin. Di destpêka serdarîya xwe de wê xwe ji bona ser Granada² date bikişandin. Ev şerê hanê bi bingehê desthilatîya wî ve hate biderkevtin. Wî ev cenga hanê di dema aşîtîya navxwe de û bi bêtirs ve date bivêxistin, bi bêyî ku ew têde bête bilukumandin; jiber

¹Ferdinandê katolikî (1479 tanî 1516 de) pir caran ew ji bal Mikavilî de di namyên wî de û di nivîsta Mîr de bi pesindan ve dihate bibîrvexistin.

²Şerê dijî Padîşahiya Ereban, ya ku paytextê wêna Granada bû, deh salan hate bidirêjkirin. Şer bi serkevtina Ferdinand ve der 4. çilê paşîna sala 1492 de hate bipayînîkirin, yê ku ew di wê demê de nala biserkevtina Filetîyê bi ser Bêolvanan ve dihate biderkevtin.

ku di rêya vê cenga hanê de serên Baronên¹ -Xanedanên- Kastalanî hatibûn bidagirtin; yê ku wan jiber remana li ser cengê de nema li ser wegêrekî de didan biremankirin. Ferdinand bi vê ve navûnîşan û deszilatî ji xwe re li ser wan de date bikarkirin, bêyî ku ew wê ji xwe re bidin binaskirin. Bi perên Kenîştê² û yê Milet ve wî dikarîbû ji xwe re Spahan bide bixwedîkirin û di rêya vê cenga dirêj de wî dikarîbû bingeh ji bona Hêza xweyî Çekdarî de bide bidanîn³, ya ku wê li paş de jê re pir navûnîşan date bianîn. Jibilvanjî de wî, da ku ew hêjbêtir pêrabûnên mezintir bikaribe bide bikirin, her gav di bin perda oldarîyê de destên xwe ji bona dirbûneke bi jan ve date biavêtin, gava ku wî Marrannen -Marrannî⁴- dane biderkirin û pêre Padîşahîya xwe date bitalankirin. Hîç rûdaneke din mîna vê nehatîye bidîtin, ya ku ew weha bi dilşikestî ve û bi tekane ve mîna vêna dê hatibe bidîtin. Di bin

¹Baronên -Xanedanên- Kastilyanî pir bi dilbijokê Serxwebûna xwe ve dihatin biderkevtin. Biyekirina Kastilya û Aragon di nava destê Ferdinand de ji bala Xanedanên Kastilyanî bi çavreşî ve lêdihate bimeyzekevin, ya ku ew di rêya markirina wîna de ji bona Isabella Kastilyanî hate bipêkhatin. Şerê dijî Ereban, yê ku ew bi cenga oldarîyê ve dihate biderkevtin, ew ji xebata wanî hundurî ve dane bivegirtin.

²Cengê dijî Ereban ji bal Kenîştê de zor jê re hate bipîştgirtin, hegerjî ku wê yarmetî ji xwe re ji bal Kenîştê û Milet jî de di bin perda pêşvexistina Oladrîyê jî de dida bigirtin, weha ji bona wêna her gav bes û bi tenha ve yek tişt dihate bidîtin, ku ew li ser vê rêya hanê de bi yekitîya spanya ve bête bigihaştin.

³Sipahê Peyadeyên Spanî di dema Mikavili de pir bi pêt ve dihatin bipesinandin; rêk û pêkbûna wan li jêr Ferdinand de zor bala dihatin biderkevtin.

⁴"Marrannos" Merov ew Merov bi vî navî ve didan binavkirin, yê ku ew bi darêço ve ji Cihuan û Ereban dihatin filekirin, belam yê ku wan di nava dilên xwe de bawermendiya xwe de didan biparastin. Ew ji Spanya di navbera 1501 û 1502 de hatin derkirin. Vê derkirina hanê li ser rewanî û abûriya devra Spanî de pir bi ziyaniyî bêqamî ve xwe date kêrkin; ji ber ku ji vê demê û pêve li Spanya de Katoliyeke sert û serhişk hate bizalkirin. Hêjbiserdeji ve welêt bi biderxistina Marrannos ve geleg Zanistvan, Hunervan û Destkar dane biwindakirin, yê ku wan ev berên zanebûnê ji bona welêt didatin bidiyarîkirin.

wê perdê bi xwe de jî ve wî xwe ji bona ser Afrika¹ date birakişandin, wî şerê xwe li Italya² de date bilidarxistin û di nêzik de jî wî xwe ji bona ser Firensa³ date birakişandin. Weha wîna hergav tiştên mezin didan bilikarxistin û bilidarxistin, yê ku wan hertim Jêdarên wîna didan bendewarîkirin û biçavkorkirin û ew ji bona bidawîkirina wan dihatin bidevvekirin⁴. Pêrejî pêrabûnekê xwe bi ya din ve dida birêzkirin, wetov ku di navbera yek kirinên wîna de tucarî dem nedihate bidîtin, ku dijî wîna li ser xwe de bihata bikarkirin.

Hêjîbêtir ji bona Serdarekî bi kelkekî mezin ve têtê biderkevtin, gava ku ew di siyaseta xweyî hundur de bi karên pir gewre ve têtê birabûn, mîna ku Merov li ser Mîrza Bernaboyê⁵ Maylandî de dide biaxivtin. Merov ji bona nimûne li ser xwe de pir dihêle bête biaxivtin, gava ku Merov li nik her rûdanekê de bête biliberkevtin, ku Merov Mirovan, yê ku wan di jîna xweyî bajartî de tiştêkî taybetîyî baş yanî bed dane bikirin, li wê gorê de bide bipesinandan yanî bide bisizakirin. Bi her corekî ve divê Serdarek ji xwe re bide biremankirin, ku ew li nik hemû kirinên xwe de navê Merovekî mezin û zanevanekî hozan ji xwe re bide biwergirtin.

Herwehaji dê li Serdarekî de rêz lêbête bigirtin, gava ku ew bi

¹Der sala 1509 de Ferdinand kenarê deryayî Afrika ji Oran tanî Terablos date bivegirtin.

²Evaya di vegirtina Padişahiya Neapel de der sala 1504 de hate bidîtin. Ji xwe re li deriyê yekem û duem de bide bitemaşekirin.

³Evaya li vê derê de rast û durust ne li ser wê cenga ligel Frensa de dide biaxivtin, belam ew li ser cenga ligel Navarra de dide biaxivtin, ya ku ew ji bal Firensiyî de der sala 1512 de hate bipiştgirtin. di çaxa ku Firensiyî li Italya de cenga didan bivêxistin, ew ji bal Pyrenäen -Pireniyan- de dihate bitirskirin.

⁴Li vê derê de ew li ser wê rêya bi nav û bang ve dide biaxivtin, ya ku pê kêmaniyê hundrû di rêya reftarîkirina siyaseta derve de têtin bipoşandin.

⁵Bernabó Visconti ji sala 1354 tanî 1385 de ligel Birayê xwe de Caleazzo II. bi Mîrzayê Mayland ve dihatin biderkevtin, tanî ku ew ji bal Birazayê xwe Gian Galeazzo de hate bidîlîkirin û ew hate bijehrîkirin. Pêrabûnên Siyaseta wîna yanî hundurî di pir çîrokên sedsalê çardehan de bi qervên nazîn ve hatin binivîsandin.

Dostekî rast ve yanjî bi Dijminekî rast ve bête biderkevtin, ango gava ku ew bi bêguhêdanekê ve xwe ji bona rexê yekekî bi dijî rexê yekekî din ve bide bikin. Biryareke wetov hergav bi kelktir ve ji bêlayîn¹ bimayîn de têtê biderkevtin; jiber ku gava du Hemsayên xurt ligelhevdû de bişerkevin, weha zînet bi vî rengê hanê ve têtê bidurustkirin, ku tu, herger ku yek ji wan bête biserkevtin, ji yê biserkevtî ve divê bête tirsandin yanjî ku tu ji wî bi niyazmendî tirsê ve nayête bikin. Di herdu caran de jî ji te re bi kelktir ve têtê biderkevtin, ku tu xwe bi eşkere ve bide bidiyarkirin û cengeke bi rûmet ve bide bivêxistin. Di cara yekem de, herger ku tu xwe nede bidiyarkirin, tu dê hergav bi pepûkê Biserkevtîvan ve bête bikin û tu dê dilê Şikestîvan bi xwe ve bide geşûxweşkirin û ji bona te ne hêviya hewarê û nejî penabûnê têtê bidîtin; jiber ku Biserkevtîvan tu Dostên li wan de gûmankirî ji xwe re nade bixwestin, yê ku ew di tengayê de jê re tu alîkarîyê nadin bikin. Lêbelêjî Şikestîvan ji bona te tu penabûnê nade bigirawkirin, jiber ku te bi çekên xwe ve hevbeşîya bedbextîya wîna nexwestîye bide bikin.

Antiochus -Antiyoxus²- li ser daxwaza Ätoler -Ëtoleran de ji bona Yunanê de hate bikevtin, da ku ew Romanîyan bide biderkirin. Wî Nardvanê xwe ji bona nik Achäer -Aşêernê- Hevalbendên Romanîyan date birêkirin, da ku ew ji bona nava serên wan bide bixistin, ku ew xwe bêlayîn bidin bikin; ji rexê din ve jî Romanîya serdana wan ji bona xeberadanê ligel wan de datin bikin, da ku ew li ser rexê wan de bidin şierkirin. Ev karûbarê hanê ji bona ber Civata Aşêer hate bidanîn, ya ku tê de Nardvanê Antiyoxus ew ji bona bêlayînê datin bibangkirin û wî biryarê wê ji wan date bixwestin. Li ser vê daxwazê û di wê Civatê de jî bi xwe jî ve Wênerê Romanî date bersivkirin: "Quod autem isti dicunt non interponendi vos bello, nihil

¹Mikavili bi Dostê Bêlayînîyê ve nayête biderkevtin. Evaya xwe di tevaya nivîstên wî de dide biderxistin.

²Ji xwe re li Runkirinên Deryê Sêyem bide bitemaşekirin. Antiochus III. Padîşahê Gewreyî Surî (223 tanî 187 b. z. de) der sala 192 B. Z. de li ser daxwaza Bendîtîya Êtolan de ji bona nava Yunanê hate bigihaştin. Ew der sala 190 b. z. de li nik Magnesia di Asya Biçûk de ji bal Romanan de hate bişikenandin.

magis aleinum rebus vestris est; sine gartia, sine dignitate, praemium victorris erttis¹."

Ev dê weha herdem bête bidîtin, yê ku ew ne bi Dostê te ve têtê bidîtin, dê ew bêlayîbûnê ji te bide bixwestin û yê ku ew bi Dostê te ve têtê bidîtin, dê ew ji te bide bihîvîkirin, ku tu bi çekdarî ve yarmetîya wîna bide bikirin. Serdarên dudilî di piranîya caran de ji bona xwe ji jêvegirtina metirsîya wê bînê de rêya bêlayînê ji xwe re didin bigirtin û weha ew xwe pê bi pirbûn ve didin biwindakirin. Lêbelê heger ku Serdare ji xwe re biyara çûna ser bendekê date biwergirtin û heger yê ku te xwe pêve dabû bigirêdan, ew hate biserkevtin, weha ew beramberî te, hegerjî ku ew wehajî bi xurt jî ve bête biderkevtin û heger ku tu jî hêjî bi wî ve bêtir bête bigirêdan, têtê bierkkirin û dostanî di navbera we de bibestandin. Merov tucarî weha bi bêavrûbûn ve nayên bidîtin, ku ew nimûneyeke wetovî bêhempa bi bêsipasî ve bidin bersivkirin û ew te bidin binokerkirin. Herwehajî biserkevtinek tucarî wisa rast û durust nayête biderkevtin, ku Biserketvan ji xwe ne bi pêwistî biwergirtina hinek guhpêdanan ve û bi taybetî ji yên dadwerî ve têtê biderkevtin. Belê heger ku ew hate bişikestî, yê ku te xwe pêve dabû bigirêdan, weha dê tu li cem wîna de ji xwe re penabûnê bide bidîtin; ew dê yarmetîya te bide bikirin, tanî ku ew jê têtê bikirin û tu dê bi Hevalê bextê wî ve bête bikirin, yê ku ew dikare xwe careke din jî ber bi başbûnê ve bide berpêçkirin. Herwehajî di cara duwem jî de, hegerjî ku pêwendî li nik Şervanan de weha bêtin bidîtin, ku tu bi tîrsa Biserkevtîvan ve jî ve neyête bipêwistkirin, rast û durust bi jîrî ve têtê biderkevtin, ku tu bendekê ji xwe re bide bigirtin; ji ber ku tu ji bona biwindakirina yekî bi alîkarîya yê din ve dide biyarmetîkirin, yê ku ew wî divabû bida birizgarîkirin, heger ew bi jîr ve bihata biderkevtin². Heger ew bête biserkevtin, weha

¹Bi Kurdî ve: "Heger ku ewên ji we re didin bigotin, divê hûn xwe ji bona nava cengê nedin bixistin, weha evaya bi tucorî ve bi qazanca we ve nayête biderkevtin; hûn dê bi bêsipasî û avrubûnê ve bi pepûkî Biserkevtîvan ve bêtin bikirin". Ev dêrên hanê di dema Mikavilê de mîna reweştê di cihê karê wî de bi zimanê Latînî hatibû binivîsandin. Li nik Livius de li gora bi bîranî ve ew bi şeweyekî din ve têtê biderkevtin.

²Mikavilî her gav dida bibawerkirin, ku jîrbûna siyasî wê dide bidaxwazîkirin, ku dewletên kêr hêz divên xwe bi hev ve bidin bigirêdan, da ku ew xwe beramberî

ew bi te ve tète bigirêdan û hîç dê nehata bidîtin, ku ew bi alîkariya te ve neyête biserkevtin.

Li hêre de divê bête bigotin, ku Serdarek divê pê guhdanê bide kirin, ku ew xwe tucarî ligel desthilatvanekî xurt de nede bihevalbendîkirin, da ku ew xwe ji bona ser yên din bide birakişandin, jibil ku tengavî wî ji bona vê dide bineçarîkirin. Ez li jor de li ser vê de hatibûm biaxivtin¹. Jiber gava ku ew bête biserkevtin, tu dê bi Dilvanê wî ve bête biderkevtin. Serdar divên li gora karîne de xwe bidin bigirtin, ku ew bi yên din ve neyêtin bibestandin. Vênêtsiyanîyan² xwe ligel Firensiyan de bi dijî Fermanrewayê Mayland ve dane bihevalbendîkirin; wan dikarîbûn xwe ji vê hevalendîtiya hanê bidin bigirtin. Bi her hawayekî ve divê Merov kevtina wan ji bona wêna bide bigerandin. Herger ku Merov nikaribe xwe ji ber hevalbedîtiyeke wetov bide bivekişandin, (mîna ku ev li cem Florentsiyan³ de dihate bidîtin, gava ku Papa û Padîşahê Spanyan ligel Leşkrên xwe de xwe ji bona ser Lombardayî date birakişandin), wêcaxê divê Serdarek ji ber hoyên li jor gotî de destên xwe li hevalbendîtiyê de bide bipelandin. Herwehaji divê hîç Serdarîyek nede bibawerkirin, ku ew dikare bi carekê ve birayarîyên ewlebûnê bide bikirin. Hêjîbêtir divê tu ji xwe re bête biliberkevtin, ku biserkevtina hemû biryarên te ber bigûmanê tète bikevtin. Evaya

dewletê xurt bikaribin bidin bigirtin.

¹Ji xwe re li dîryê sêyem de bide bitemaşekirin.

²Di deriyê sêyem de Mikavili li ser vê siyaseta Vênêtsiyan de date bigotin: " da ku ew du bajarên di Lombardi de ji xwe re bidin bikarkirin, wanan Padîşahê Frensî ji bona Sêyemî Îtalya dane bimîrzakirin." Li ser bingehê peymanekê ligel Ludwig XII. Firensî de belê ligel dewlete xurt de Vênêtsiyan dixwestin, ku ew ji xwe re du cihan li Lombardi de der sala 1499 de bidin bivegirtin.

³Ji ber ku Florents di şerê navbera Ludwigê Duwazdehemînê Padîşahê Frinesi û "Hevgirêda Perest" bêlayîn hatibû bimayîn, şikestina xwe date bimisogerkirin. Ew ji bal Sipahên Spanî de hate bişikenandin. Prato hate bitalankirin, Serdarîya Komarî li jêr Soderini hate bixistin û Medici li jêr givaştina Papa de careke din hatin bidanîn. Mikavili bi xwe jî ve bi gorîvanî bêlayînbûna siyaseta Florentsê der sala 1512 de hate bikirin.

carekê ji caran di derbasbûna tiştan de têtê bikevtin, ku Merov tucarî nikare xwe ji xerabîyekê bide birizgarîkirin, bêyî ku Merov xwe ji bona yekeke din nede birakişandin. Jîrbûn di wir de têtê biderkevtin, ku Merov rengê xerabîyekê ji xwe re bide binaskirin û Merov ji xwe re xerabîya biçûk nala piçekî başîyê bide biwergirtin.

Hêjîbêtir divê Serdarek xwe nala Dostê kirinên jêhatîbûnê bide bixuyanîkirin, gava ku ew Kesên bi rêk û pêk ve dide bipêşvexistin û hozanên berekî dide biavrûkirin. Biserdejî ve divê ew ji bona Neşînvânên xwe nav di wan de bide bidan, ku ew bi aramî ve kar û barên xwe di bazirganîyê de, di çandinîyê û di her karekî din de bidin bikirin, da ku Kesek xwe nede bizdandin, ku malê xwe ji tirsan nede bipirkirin, ku belkî ew jê careke din dê bikaribe bête bisitendin. Herwehajî divê yekekî din jî xwe ji tirsan bêşan nede bibizdandin, yê ku ew ji xwe re firoştgehekê dide bivekirin. Serdar divê hêjîbêtir xelatan ji bona her Kesekî bide bidanîn, yê ku ew dixwaze bi pêrabûna kar û barên wetov ve bête birabûn û yê ku ew dide bimebestîkirin, ku bi şêweyekî ji şêwan ve dewlemendbûna bajarê xwe yanjî welatê xwe dide bipêşvebirin. Biservanjî ve divê ew di demên lihevhatîyê salê de ji bona Milet cejnan, şahîyan, govendan, semawendan, yarîbazîyan û pehlewaniyan bide bilidarxistin¹. Jiber ku di her bajarekî de Sazmendîyên Destkaran yanjî Qatan têtin bidîtin, divê ku Serdarîvan ji bona van Gurûhan guh bi wan ve bide bipêdan, carcaran ew ligel wan de bête birûniştin û ew hergav nimûneya dilxweşbûnê û merdbûnê bide biderxistin, nejhêjkêmitir ji vê divê ew hergav Meznahîya cihê xwe jî bide biparastin, weha divê evaya li cem tu kêsan de neyête bikêmkirin.

¹Di dema Karnaval -Şahîya bi cil û bergên Poşandî ve- û li nik kêsan din de. Merov ji xwe re Lorentzo Magnifico bide bibîrxistin, yê ku bi xwe jî ve sitiranên Karnaval didatin binivîsandin, yên ku ew ji bal Milet de dihatin bisitirandin.

Derîyê Bîstûduwem

Li ser dilsozîya Kardarên pê re¹, yên ku Serdar wan li dorhêla xwe de dide bidîtin

Ne bi kêmbûneke giringî ve ji bona Serdarekî helbijartina Kardarên wî jê re têtê biderkevtin. Magelo evanan baş yanî nebaş têtin bidîtin, ev bi jîrbûna Serdar ve têtê bigirêdan. Dîtina pêşî, ya ku Merov wê ji xwe re li ser bihişbûna Serdarekî de dide biwergirtin, dê ew di rêya Merovên dorhêla wî de bête binîşankirin. Evên hanê bi karîn û bi dilsoz ve têtin biderkevtin, wetov hertim Merov dikare wî bi Jîrvan ve bide bidanîn; jiber ku ew pê hatîye biliberkevtin, ku ew karînen wan bide nasîn û dilsozîya wan ji xwe re bide biragirtin. Belam heger ku ew halo neyêtin biderkevtin, wisa Merov dikare ji xwe re hergav dadwerîkirineke nebaş li ser Serdar de bide bigirtin; jiber ku ev helbijartina hanê bi şaşbûna pêşî ve têtê biderkevtin, ya ku wî ew ji xwe re dayite bikirin. Heryekî, ku wî Mîrza Antonio - Antonyo- da Venafo² nala dilsozekî Kardarê Pandolfo Petrucci -

¹Di vê navnişanê de Mikavili li ser Secretarii -Sikretêr, Yawir- de û ew nava nivîsadinê li ser Ministri -Wezîr- de dide biaxivtin. Ji bona wîna herdu beramber bi Serdar ve mîna hev têtin biderkevtin. Em ji bona van herdu gotinan gotineke dinî nenala dema Mikavili didin bidanîn. Ji bona Mikavilê Wezîr û herwehaji Yawir ew bi Merovên dilsoz ve di cihên karên xwe de dihatin bidîtin. Li gora dîtina me de bawerîya Mikavili derbarê Yawir de bi durust ve têtê biderkevtin, belam ew derbarê Wizîr bi durust ve nayête biderkevtin. Jibervêjî ve li vir de gotina Kardaran ji bona şuna herdu gotinên din hate bihelbijartin.

²Antonio Giordani da Venafo (1459 tanî 1530) li Siyena de bi Mamostê Mafe ve dihatê bidîtin, li paş de ew bi Dawer bû û di dawî de ew bi Şêwirdarê Pandolfo

Peruşîyê- Mîrzayê Siena -Siyena- ji xwe re dida binaskirin, Pandolfo Petruşî nala Merovekî pirî gewreyî jêhatîyî mezin dida dadwerîkirin; jiber ku wî Merovekî wetov bi Kardarê xwe ve dabû bikirin.

